

DILNAME

8

4-8-2011

Rojnameyeke Rewşenbîrî ye Serbîxwe ye - www.dilname.wordpress.com


AZADÎ DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE

(Lêkolîn)

Mehmûd Badilî

mbadili3@hotmail.com

(Heskê - Sûriya)



Dilname©

Azadî berî ku pêdiviyeye civakî be, pêdiviyeye kesayetî ye, her kesek azad û serbest xwedê dide, îca divê ku azad jî bijî û jiyaneke xweş û şad û şêrîn biborîne, ji ber vê yekê, em dişopînin ku herdem li ser dirêjahiya dîrokê û ji kevn ve, kêferat di navbera kes û civakê, hêzên biçûk û yên mezin, millet û desthilatdaran, karker, cotar, palevan û koledaran de...t.d lidare. Îca pirsgirêka azadiyê pirseke dîrokiye, pêdiviyeye kesayetî, civakî û mirovatî ye, di her gav û demê de. ... **Dûmahîk Rûpel:7**

HEVPEYVÎNEK LI GEL NIVÎSKAR SALI H DEMÎ CER

**NIVÎSANDINA ROMANÊ NE QONAXEKE
PÊŞKETIYE JI NIVÎSANDINA ÇÎROKÊ RE.
EZ BI ÇAVEKÎ RÊZDARIYÊ LI XEBATKARÊN
ROJ TV DINÊRIM.**

Nivîskarê kurd Salih Demîcer di sala (1972) an de li gundê Şêranê; herêma Kobaniyê; Sûriyê ji dayik bûye, xwendina xwe ye destpêkî û navendî li gundê Şêranê xwendiyê, lîse jî li bajarê Kobanî stendiye, ji ber nîrên aborî yên dijwar nikaribû xwendina xwe ye bilind di dema- ... **Dûmahîk Rûpel: 19**



Dilname©

DÎROKA HACKER'IYÊ Û HACKER'ÊN NAVDAR

Occo Mahabad

occo74@hotmail.com

www.bernamegeh.net

(Wan - Turkiya)



Bernamegeh

Hacker'î çawa dest pê kir?

HACKERÊN TELEFONAN Sal:1878

Şirketekê telefonê hebû, navê wê şirketê Bell Telephone bû. Du ciwanên jêhatî diketin xetên telefonan û pê bêpere, beleş xeber didan. Wê demê ev karê Hackeriyê wek sûcekî nedihat dîtîn, tiştêkî- ... **Dûmahîk Rûpel: 11**

GOMIK

Enwer Karahan

enwerkarahan@hotmail.com

(Swêd)



Tam seet û nîveke wî qediya ku ew li ser qoltixa xwe rûniştibû.

Bê mexsed. Bê raman. Hewante. Ji nişka ve li xwe hay bû û rabû ser xwe, lê nizanibû dê çi bike. Çavê wî li wê pakêta cixareyan ku li ser maseyê bû ket. Ji pakêta Camelê rahişt cixareyekê û berê xwe da ber pencereyê. Cam li hêlekê xist. Cixareya xwe vexist û li dengê ku ji derve dihat guhdarî kir. Ji xêndî dengê xuşîniya baranê tu deng nedihat. Dinya sehal bû. Bê deng bû. Du gulp ji cixareya xwe kişandin, paşê ji qatê heyştan li jêrî nêrî. Gava dilopên barana ku li- ... **Dûmahîk Rûpel: 10**

WÊJEYA KÛRÎ*

Wêjeya Kûrî bi rengêkî dîrokî dihête rêzkirin bal serdemên kilasîk û nûjen. Wêjeya Kûrî ya kilasîk teqalîdên gelêrî bi pîrensîpên olî û filosofî yên *Bûdîzm* û *Konfoşîzm* û *Tawîzm* girêdan. Bijareyek rewşenbîrî nêrî serdest gewdê kilasîk yê wêjeyê pêşxist ew jî ji demên pêşîn ta dawîya torina *Çoson* ya desthilatdar di 1910^{an} de. Wan bi tîpên Çînî dinivîsand. Tîpên Kûrî, **Hangul**, di sala 1446^{an} de hat pêşkêşkirin, lê pejirandinek berferêh wekû zimanekî wêjeyî wernegirt ta sedsala 20^{an}. Derfeta gihiştina *Hangul* bal hemû tebeqeyan hişt ku bingeha civakîya wêjeya Kûrî di- ... **Dûmahîk Rûpel: 18**



Dilname©

Xiyas Hisên

dillehii@yahoo.com

(Kobanî - Sûriya)

ÇIMA JI HEV DÛR?

Kes vê rewşa zaneyên kurd naecibîne. Zêde ji hev dûr in. Ji bona zanayan û nîvzanayan. Rabuye hê di xortaniya xwe de ketiye govendê, dismal di dest de ketiye serê dîlanê. Stiranên xelk jê ditirse, wî bi meqam gotine. Diçû ji xelkê re digot: 'Metirsin, em li vir in... Êdî bes e, xwe ji dîlanê re hazir bikin.' Kitêb di binê çeng de, darsa gedeyên gundî didan. Ji wan re digot: 'Li ezmanan filan filan stêrik heye. Bav û bapîrên me, bi kurdî nav bi stêrikên rû ezmanan ve danîne.' Gelavêj, Perwîn, Nahê û Sat, çar stêrik li ruyê ezman, nav **Kurdî**. ... **Dûmahîk Rûpel: 23**



Xurşîd Mîrzengî

axursidmirzengi@free.fr

(Parîs - Frensa)

ÊLA MIN



Henîf Yûsuf

hanifyoussef@hotmail.com

(Laydin - Holenda)

Heger ez jarbûm, bi destê
we bû

ger istûxwarbûm, bi destê
we bû

weha li min bû çerxa
felekê

ezê her bêjim ewin fêlên
we

tenê bi min ra, tenê bi min
ra

ji lew ra dibêm:

hûn ji êlekê ez ji êlekê.

ji zikmakî da dîlê me yeke

lê zimanê we qet ne yê
mine

dîlê mine her ji ber we b-
tenê

bi tenê maye, ji ber wê
yekê

ez li hêlekê hûn li hêlekê

hûn ji êlekê ez ji êlekê.

Êla we j-we ye , û ji yêd
wek we

êla mi b- tenê maye li
hêlekê

ger mi j-we dîba hezkirinek
xweş

bi zerkik av ra û nanê
sêlekê

minê bi gota tijî dengê xwe

em tev bi hev ra giş ji
êlekê.

we her ez kirim sazbandekî
ha

ku bibim xudyê saz û
têlekê

teví hûn zanin ne
sazbandim ez

ne jî gavanek ji yên êlekê

lê ger bi sazim saza mine
ew

jê her tim werê dengê
helbestan

yên ji eşqê ra wek
berdêlekê

helbestên asê yên kedî
nabin

ne b- darê zorê, ne b- zêr û
zîve

yên hostekarên weha
fêlekê.

We dunya li min, her kire
tofan

tofanê ku hîn, bêtir ji yê
nûh

hûn bi gemîne, ziman bi
hingiv

cîh didin kesên li gor
mêlekê

lew gemî ya we, ya
nandoza ye

cîhê xwe tê da, tucar
nabînim

cîhê mine her, ada evînê

l- derya evînê li ser pêlekê

ji lewra dîsa êdî dibêjim

hûn ji êlekê ez ji êlekê .

HER KESEK

Ehmedê Xanî

(1650 - 1707)



Zahidê xelwet-nişîn pabendê girdarê xwe ye¹
Tacirê riñlet-guzîn derbandê dînarê xwe ye²
Aşiqê dilber-ñebîn dildarê dîdarê xwe ye
Da bizanî her kesek bê şubhe xemxwarê xwe ye³

Bê 3emel tu j kes meke hêvî 3eta û himmetê
Bê xered nakêşitin qet kes ji bo kes zehmetê
Kes nehin qet hilgirit barê te ew bê ucretê
Ger çi 3îsa bit ewî fikira ker û barê xwe ye

Hoşiyar be da nekî 3umirê xweyî hasil telef
Lew ku nadit faîde mal, genc û ewlad û xelef
Macerayê Xidir û dîwarê yetîm bûye selef⁴
Vî zemanî her kesek mi3marê dîwarê xwe ye

Ca nezer dî tu bi pêla ku we waqî3bit sewaş⁵
Ger nebîtin iltîfat û mewceyê debir û me3aş⁶
Çendî rimbazê di faris naditin canê belaş⁷
Sa3eta serbazî hêvî wî ji serdarê xwe ye⁸

Xanîya dai3 meke weqtê xwe ey nadan 3ebes⁹!
Bê teleb nabî ji 3işqê behremend ey bulhewes¹⁰
Sani3ê mutleq ku nîne iñtiyacek wî bi kes¹¹
Lutif û iñsan ji ewî der ñeq telebkarê xwe ye¹²!

* Jêder: Ji danhevên 3ebdil-Rehmanê Kurimî (3evdî)

1-pabendê girdarê: girêdayî hewesê. 2- guzîn: hilibjartî,
derbandê: li hêviya 3- şubhe: guman 4- selef: tiştêkî çûyî 5-
waqî3bit sewaş: çêbûye ceng 6- iltîfat: guhdan 7- faris: siwar
8- serbazî: ceng / leşkerî 9- Xanîya: ey Xanî, dai3: wenda,
nadan: nezan, 3ebes: bi bêşûdî 10- bulhewes: xwedî
derd/girêdar 11- Sani3ê mutleq: Afirênerê bêşînor / Yezdan.
12- iñsan: xudannasî / perestî.

AZADÎ**Sîpanî**

sipani65@hotmail.com

(Wan - Turkiya)

Îro ez ne ezim
gundî kî nexwenda me
pîrsîyar im ji zana yê xwe
çîye azadî? zana
na dibê. Pîrse ji azadî yê?
bila ew bersîv de

azadî tu çî yî?
maldarî yî
çîya û banî yî û zozan î
birê pezî kerî yê beran î
hespe kumeytê kihelê kapreş î
tu koşka bilind î
sera Axayî Mamed î
trampela Jaguar î

tu
vexwarina ava sar î
xarina keledoş û pîvaz î
sêv û hinarî nane loş î
zava yê dest bihene yî
bûka ser bi xêlî
pişta çîya ye Qaf î
nagihêjme te tû elî
zumrût û enka yî
teyrê sîmirî, baz î
kewa gozelî
kebotkî qaqlîbaz î

tu
Rostemê Zal î
Herkûlê Yewnan î
xewnî yan xeyal î
merşî al î welat î
ji xwe welat bi te al û welat î

tu
yara çev reş î
birîyê belek î
porê xeleq î
simbêla qeytan î
tembolî ya xortan î

tu
fermandarî ya Silhedîn î
desana Xanî yî
evîna Melê yî
hebestê Feqî yî
serhildana Şêx î
kitêbê Seîd î
klamê Şakiro yî
dengê Şivan î

tu
serbixwe yî
wekhevî yî
komelî yî
komarî yî
sazumanî yî
lijne yan
karsazî yî

dîsa idî ez ezim
ti bersivam neda

azadî pişiri û
xwe kerkir
wek bûka bixêl î
li men û zîne nêrî
Xanî gotî ye: "mehra te
hemîyet" e
bi mi jî
tu

"îkram a Xweda yî"
naguhirim te bi tu awayî

ey yezdanê Mezin
em ji te azadî dixwazin
rih û can ê xwe fida kin
gulistanê ava kin
kesk û sor û zer geş kin
dilê gelê xwe pê xeş kin
gazî rihê Melê kin
Feqî û Xanî jî pêk kin
Bedirxanan û Berzanîyan
Berzencî û Qazîyan
Bila bi rih dest biçirpîn in
azadî yê serbixînin

wî wextî
bila dilê min ji singa min bifir
rih ji canê min bê pirr..

Wan: 27 - 03 - 2007

ENSTÎTUYA KURDÎ LI PARÎSÊ

Di Sibata 1983 an de hatiye damezirandin. Serokê wê yê hîlbijartî ji sala 1996 an de Dr. Kendal Nezan e ku li Firansayê fîzyazanekî newewî ye û pisporekî navdar e di warê Kurdnasîyê de, birêvebirê tilivizyona Kurdî ye. Dr. Nezan di sala 1975 an de Civaka Firansa-Kurdistan damezirandiye, ku rewşenbîrên pêşeng wek Jan Pol Sartir têde hebûn.

Enstîtuya Kurdî saziyeke serbixwe ne siyasî û ne olî ye. Ew rewşenbîr û hunermendên Kurd yên ji her alîyî tevî Rojavayîyên pîspor li ser lêkolînên Kurdî dihewîne.

Armancên wê ev in: Parastina nasîna civaka Kurd bi zimanê xwe û dîroka xwe û kelepûra çanda xwe, û beşdariya di tevîbûna Kurdên koçberên bal Ewropa di civakên wan de ji bo Kurdan û çand û welat û rewşa niha ya wan bi raya giştî bidin nasîn. Ev sazî li ser destê çend rewşenbîr û hunermendên Kurd hatiye destpêkirin wek: Sînemager Yilmaz Guney û helbestvan Cegerxwîn û Hejar Mukriyanî û zimanzan Tewfîq Wehbî û pirofesor Qenatê Kurdo û nivîskar Hacî Cindî û Nûriddîn Zaza û wênekêş Remzî Rasa ... hd.



Ev sazî piştgiriyê ji gelek rewşenbîrên Rojavayê distîne, ji nivîskar û hunermend û siyasîyan, û wergirên Xelata Nobelê û rojhilatnas û xwedî saziyên cûr bi cûr. Ji wexta damezirandinê ta niha Enstîtûyê ji bo pirojeyên xwe sûd ji alîkariya giştî ya hukûmeta Firensî girtiye, her wiha ji saziyên cihê jî girtiye, wek CCFD û Fondation France-Libertés û Médecins du Monde.

Dawiyê, ji ber bandora xurt ya Enstîtûyê li ser astê Ewropayê, Yekîtiya Ewropa tevî gelek saziyên fermî yên Ewropayê alîkarî dan wê.

ROLA JINÊ**Xelil Misto**

zarakobani@hotmail.com

(Kobanî - Sûriya)

Di civaka gelê kurd de, jin roleke girîng dibe û dilfêze, ji despêka dîroka gelê kurd de, jinê li kêlka mêr berpîrsiyariya civakê dikir, jin diçû palê, cot dikir, dengbêj bû, diçû şer û cengê, jinê rêberiyamalê, malbatê, êlê wek mêr dikir. Ev dewlemendiyeke mezine di rola jinê de.

Roja îro jina kurd rola wê berferetir bûye, ew xwe dibîne xwedan name û armanc, û dixweze heja xwe berede mofirkên asoyên jiyane, jiyana zanistî, çandî, aborî, hunerî, siyasî.

Ew diwxaze xew pêşkêşe wek mêr di rûpelên jiyane de bi rengê xweyî tayebet.

Lê ku hinek kes jinê bê rol dibînin, ew sedema vedigere çanda herêma me.

Jina kurd karibû di demeke nêzîk de hinek kelemên civakî ji pêş xwe rakirirana, lê xebata jinê berdewame, ew roj bi roj azadiya xwe berhimêz dike.

Ji mêr tê xwestin ku ew jî alîkar be bi jinê re, ta ku karibe bêtir rola xwe bilfêze di civakê de, piştî guhertinên li dunyayê, jina kurd xwe di hindir wan guhertinan de dibîne û wan pêşwaz dike û pêre hevgerinê çê dike.

Tê xwestin ji rêxistin û encûmanên ronakbîr û mirovane dase xwe bibe di warê mafê jinê de, ew yekem berpîrsiyarin di vî warî de.

Ez bawerim wê jina kurd di demeke nêzîk de bibe xwedan rol di civaka me de.

**DAXUYANÎ JI KOMÎTA
AMEDEKAR
YA MIHRECANA
HELBESTA KURDÎ YA 16
LI SÛRIYÊ**

Di vê rewşa awarte de ku welatê me Sûriya tê re derbas dibe, û tevgera gelêrî ber bi azadî û dadiya civakî de gavin bi coş davêje, û di vê pêvajoyê de gelê me jî hewl dide û çalakiyên aşityane û şaristanî berdewam dike, ji bo bi destxistina mafê xwe yê netewî yê demoqrati di çarçewa dewletek şarewar (sivîl) û demoqrati û fireregez de. ku ciyawaziyê bi hemî şeweyên xwe qedexe bike û li ser bingehê erk û mafan wekhevîyê di navbera welatiyan de pêk bîne.

Li ber vê dîmena siyasî, di 22/7/2011.z komîta amedekar ya mihrecana helbesta kurdî li Sûriyê, civînek çêkir û tê de geftûgo li ser kar û barê mehrecana 16 an kir, wisa jî civîn rawestiya li ser rewşa ku mihrecana 15 an tê re derbas bû û helkutana ku ji hêla asayîşan ve li ser çêbû û di encamê de du helbestvan û xwediyê malê hatibûn girtin.

Piştî geftûgoyê civîn gihişte van biryarên jêrîn:

1/ Bi navkirina şazdemîn mihrecana helbestê bi navê **Mihrecana Azadiya Zimanê Kurdî**.

2/ Lidarxistina mihrecanê di dema wêyî naskirî de di dawiya meha çerya pêşî de.

3/ Mihrecana azadiyê eşkere û vekirî ye , vexwendin giştî ye bo hemî helbestvanan, û helbest tê de nayên nirixandin û hemî helbestvanên beşdar dê helbesta xwe bixwînin.

4/ Xelata rêzgirtinê tenê, dê di mihrecanê de bê nîşankirin.

Gelî helbestvanên hêja, dost û birayên delal, hûn dikarin helbestên xwe dest bi dest bigihînin û yan jî li ser E-mail a mihrecanê bişînin: mehrecanahelbeste@gmail.com

Bi hev re Ji bo serkeftina Mihrecana Azadiya Zimanê Kurdî

Komîta Amedekar ya Mihrecanê

22/7/2011.z

**MARIE YANAKA
ŞAHA
ÇELENGIYA
YABANÊ YA
SAL 2011 YE**



Di meha Nîsanê borî de Marie Yanaka wek şaha çelengiya welatê Yabanê ji bo sal (2011) hate hilbijartin.

Li zanîngeha Keio beşê Mafnasiyê dixwîne.

Di amedekirina çayê de pispore û keçek zîreke.

Ji xwendin û nerîna filman hezdike.

Di zimanê Ingilîzî de zor berze.

Piştî zanîngehê dixwaze bibe pêşkêşvaneke tilivizyonê.

Temenê wê 21 salin.

Dirêjîya wê 165 cm.

Giraniya wê 50 kg.

Sîng 83 cm.

Kemer 58 cm.

JI PÎŞEYÊN KURDAN CEBIRANDINA HESTIYAN

Li ser zimanê:



Mihana Cimo

(Şêran - Sûriya)

Mihana Cimo cebarçiyek / hestîvegireke ji gundê Şêranê li herêma Kobanî ye, di derdora sala 1925 an de ji dayik bûye. Ev bû 50 sal û bêtir karê cebirandîê li mala xwe dike û hêjî nerawestiyaye.

Destpêkê ji dayika xwe hînbûye, û pêşiyê eger nig ê berxikekê yan karekî yan mirîşkekê dişikest wê dicebirand, ta niha jî ajelan ji wê re dihênin bo cebirandinê. Paşê karê xwe li ser mirovan meşand. Niha jî, qîzek wê bi navê Sebah vî karî li mala xwe berdewam dike.

Kes mîna wê nizane, ne li Şêranê û ne li Kobaniyê. Mihanê karê pîrikiyê ji bo jinên ducanî/avis dikir. Lê niha mezin bûye û êdfî nikare barê pîrikiyê hilgire.

Wek tê dîtîn ew pir-kar bû. "Pîrê her kar dikir", kurê wê, Mihemed Remmo, dibêje "Rojekê em hatin me dît Pîrê nigê yekî çirandiye û dirûtiye jî, xuyadikir ku mîna operasyonêkê jê re çêkiribû!!".

Ji berê de Mihanê ev kar bi xêra xwe dikir, ango bê pere dikir, û ji xwe bavê zarokên wê jî ji vî tiştî razî bû.

NEXWEŞÎ Û DERMANKIRIN

1- Şikestina hestiyên destan û nigan: Pir êş ji ber şikestinê peydadibe, bi taybetî dema cebirandinê. Bi pisporiya xwe Mihanê hestiyên şikestî dixê cî û weha weku berê dicebirîne, di vir de cebarek/bendek ji ard û hêk li ser paçekî dirêj raxistî bikartîne, digel çend darikan ku li hawîr destan nig digerîne. Li gor kesên ciwan 15 roj giringin û li gor kesên salyar 20-30 rojin ta hestî bi hev bigire.

2- Şikestina bazinê ustû: Cebirandina vî hestiyî ne mîna ya dest û nigan e, şûna darikan yek ji pere yên hesinî û pehin datînin ser dera şikestinê û yaxakê bi dirêjkayî li ser dişiddînin.

3- Jicîderketina hestîyan: Dema hestî ji cî yê xwe derdikevin bi awayekî taybet Mihan wan vedigerîne cî yên wan. Paşê yaxê/lezqekê li ser werdigire.

4- Êş hestiyên: Dema hestî yan navbera wan, yan jî mivikên piştê diêşin, girînge ciyê êşê bi ava germ pakbibe û dûv re benîştê daran (mezdekî) di avek germ de bihête pehinkirin, li gor cî yê êşê, û li ser paçekî ji pembo bihête danîn, paşê li ser hestî bihête raxistin û yaxakê lê dixin. Piştî du-sê rojan gerege bihête rakirin, û dubare bibe ta êş wenda dibe.

5- Kevirên gurçikê: Ji bo wê poçikên misirê/garisê digel bextenûzê bi hev re dikelînin û ava wê disefînin û wê avê li xurnî vedixun, îcar çî di kîsê mîzê de hebe dişo.

6- Serşikestin: Berê ku serî dişikest û xwîndibû, şekirê çayê bi ser birîn a serî de werdikirin, û xwîn bi vî awayî hişkdibû.

7- Kunêr/kwînêr: Piraniya kunêran serên wan zerdibin û kok ên wan qalind in. 'Elor/lebxê jê re dermane. Ev 'elor ji hevîr çêdibe yan ji gihayê bantofê/batovê. Dema vê li kunêran dikin ew derdibin û ew kêr û gemar ji wan derdikeve û pakdibin, ta sê-çar rojan dadikevin û rihet dibin.

8- Rîş: Rîş kunêrên pir bi êşin û kûrin. Dermanê wan hebên kulê/iltîhabê ne ku tev li vezelînê yan rûn/don ê pembo dikin û li rîşê dixin ta rihet bibe.

9- Xura sivik: Soda dixin nav avê û laşê xwe pê dişon, bi mezinî ya hêkekê ji soda dixin nav satilek av, piştî se'etekê dû şuştinê, gerege mirov xwe bi av a pak bişo.

10- Êşa Çavan: Heger çav sor bibe û kulbibe gihayê beybûnê/babenêçê dikelînin û bi pîvana dilopekê dixin wî çavî, çî gemar di kaniyên çav de hebe ta sibehê derdixîne, lê belê çav hinekî dişewite.

11- Vedana Dûpişkê: Gihayek heye jê re dibêjin: Bîstan pozan, cûreyek ji reyhanane di havînê de derdikeve, piştî dikutin li şûna vedanê dikin.



HIN DERMANÊN TAYBET

1- Şeb: (bi Ingilîzî: alum) kevirêkî wek xwê bê renga, ji bo birînan bicivilîne hev dihête bikaranîn.

2- Azwa: Me'idenekî/kanekî wek nihase, ji bo rîşan dermanekî pir xurte, niha pir nahête bikaranîn, dixin nav şîr û kunêran pê digerisînin/daxdidin.

3- Bantov/batov: Gihayeke li çolê derdikeve gulên wê zerin, pez pê nexweş dikevin û çermê wan belek dibe. Ciyên werimî pê daxdidin yan dibe lebxê.

4- Goştê sor: Dema rehê xwînê di hundur çerim de diteqin, goştê sor dikutin û lê dixin, -

... Dûmahîk Rûpel: 6

JI PÎŞEYÊN KURDAN CEBIRANDINA HESTIYAN

... Dûmahîk:

-ji bo wê xwînê belavbike, ta roja din.

5- Rûn/donê pembo yan Vezelîn (Vazlîn): Ji bo terikandina çerim wek melhemê bikartînin. Û bo êşa gewriyê û kuxika giran û dema sîng (pişik) dihête girtin û hilim giran diçe û tê, ku mirov dema berî razanê wek libekê dixê nav desmalek pir tenik û biçûk, û dadiqurtîne û avê bi ser de vedixwe.

6- Pîvaz: Ji bo êşê/zekemê/sermê ye, ku dibirêjin paşê îsota hûr û xwê pê werdikin û dixun ta êş rihet bibe. Û ji bo kunêran jî dibirêjin û dikutin û li ser kunêrê dixin û paçekî lê girêdidin.

7- Mûyê Bizinan: Dema birîn zêde pîs dibe yan xwîn di derek kûr de teqîya be, vî mûyî tev hinek rûn û xwê dixin tawekê û diqewirînin paşê dixin nav paçekî û şûna êşê digerisînin tawê xwênê ji dor birîne belav bike.



8- Hevîrê bi Xwê: Werimandinê dadixîne, ji êvarê ta sibehê. Hevîr li ciyê êşê digerisînin ta roja din.

9- Dawa/Dûvê pez: Ji bo nexweşiya dîskê a movikên piştê ye. Ku tev li xurman dikin û dikutin û li piştê dixin û girêdidin ta çend rojan mirov li ser zikê xwe paldide.

10- Şehim: (bi Ingilîzî: Grease) bo kunêrên di bin çerim de ye, ew kunêrên ku dernabin. Şehimê lêdikin ta derbibe û rihet bibe.

MIN ŞOP AJOT..



Dilawerê Zengî

dilawerzengi@nefel.com

(Şam - Sûriya)

Li welatê rojê...

Li delava derya sipî,

Li welatekî kuştî,

Li çiyayê gurandî,

Li deşt û nehêlên darvekirî,

Li ser hilma xwîna kizirî,

Min şopa xewna xwe ajot...

Li rojhilat,

Heyva çarde me..

Rêvingên rîya birîndar..

Ez û pênivîs û qetek nan.

Di dilê şevê de,

Di cegera asîman de,

Di rêkên herifandî de,

Bi gavên xweyî razayî,

Li ber dîwarekî bê guh,

Min pênivîsa xwe şiyar kir.

Kerwanek ji stêran,

Neynika xewnên min şikandin.

Çûkên ramanên min firandin.

Di çavê şeva kor de,
Bi xewnên pêçayî,
Dilbijandina pênivîsê,
Talankirim..
Wêrankirim..
Lê, min şop ajot...

Ez û pênivîsa xwe,
Bi refên kul û derdan,
Bi xiştexiştê pênivîsê û
kirtekirta nanê tisî,
Bi gavên birîndar,

Bi zimanekî bê giyan,
Ji salên bê demsal,
Darbesta demên beravêtî,
Li milên miriyan bar kirin .. û
Min şop ajot...

Şev û roj li me bûn hêlan..

Di quncikên kit kita çerxê,

Movikên demê digurînin..

Li deşta Mêrdînê,

Li ber dêmên gula berberoj,

Pencên rojê yên qemirî,

Li ber sîka bê ken,
Agirê sar û westiyayî,

Çemên dîl û giriftar,
Li deşta leylan û awêze,

Bi pêlava xewnên pênivîsa xwe,

Min şop ajot...

Homanên xêrnexwaz,

Di qoqê kewênêr de,
Hêlînek belavkirin.

Di gerîneka çavan de,

Şopa xwînê gerandin.

Li ber seqema hewesa min,
fenera dilê xwe vêxistin.

Li ber pencera demên min,

Bêndera demên xwe gêrandin.

Li ser baskên xewnên min,
Hêviyên xwe veçirandin.

Li ber deşta ramanên min,

Dehl û zeviyên xwe şînkirin.

Li ber germbûna devê birînen min,

Termên hêsrên xwe ziwa kirin.

Li ber saza ahînen xwîna min,

Peyala meyê gerandin.

Û li ber çingîna peyalan,

Min şop ajot...

Di gerînoka mişextiyê,

Di şevînen qetiyayî,
Di awêza awareyî,

Li çiyayê gerdenezad,

Ji girêbend û lalên zinger bûyî,

Kewênêr bi azatî azad bûn...

Bi qeqebeke nû,..
Bi dilekî aza..

Bilûra xwe saz kirin..

Û bixwe re..

Mizgîniya maçîkirina heyvê anîn..

Şam /1/5/2011

AZADÎ DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE

... Dûmahîk:



Ew kêferata ku ji kevn de her carê lidardiket, bêtir di navbera millet û desthilatdariyê de bû, wateya azadiyê di wê demê de dihat nixandî ku kesan ji zor û zordestiya desthilatdaran biparêzin.

Gelek şoreş û serhildanên mezin di vî warî de ji bo azadiyê lidarketin, di rêya wan şoreşan re gelek millet serfiraz û serbest bûn.

Gelek welatên şarewer, gavin baş û bikêrhatî di vî warê de bi pêk anîn, pişt re yase û destûr û bendin şaristanî danîn û di rêya wan yaseyan re desthilata yê Hakim li ser millet bi bend û best kirin, mafên siyasî, civakî, aborî û rewşenbîrî parastin, ku yê desthiladar (Hakim) nema dikare zordestiyê li milletê xwe bike, û nema dikare bi stûbariya xwe ranebe yan karê xwe li paş bixîne.

Ji nav koma milletan, îro milletê kurd hîna ji bêhna azadiyê bêpare, kurd (xak û millet) ji sala 1916 an de li gorî hevbandiya Saykes – Bîko hatin parçekirin, nuha di bin desthilata çar dewletan (dewleta Tirk, Îran, Iraq û Sûrî) de dijîn, kurd di hindirê van dewletan de - ji bilî başûrê kurdistanê ku nuha ji çend salan ve serfiraz dijîn - ji hemû mafên xwe bêparin, mafê netewî (çarenûsî), siyasî, civakî, aborî û rewşenbîrî, tevku milletê kurd rojekê ji rojan kar û xebata xwe li paş nexistiye, bi dehan raperîn û serhildanên mezin dijî rêjîmên wan dewletan lidarxistiye, lê mixabin-

-herdem dibû qurbana berjewendiyên dewletên mezin.

Seydayê Cegerxwîn di derbarê pirsgrêka azadiyê de, dest danîye ser gelek êş û nexweşiyên ku milletê kurd pê diêşiya ku ta niha jî pê diêşe, di vî warî de bi bîrwerî xwe nêzîkî gelek kêşeyên ku bûne sedemên bêparbûna milletê kurd ji azadiyê, ew êş û kêşeyên ku ta niha hiştiye milletê kurd bindest bimîne.

Hema yek ji va êş û nexweşiyên, girêdanên ku di navbera hinek sergiranên kurd û dijminan de çêdibûn berçav dike, îca rê dide ber wan ku guh li dijmin nekin û mal û perên xwe ji bo serbestiya milletê xwe xerc bikin, û dide xuyakirin ku ta milletê kurd rizgar bibe divê her yek ji aliyê xwe ve, mal û canê xwe jê re bike gorî:

*Ey sergiranê kurdan , bin dest û dîl e
kurd tev;*

*Giriyê me tê li ser we , xew bo me
nîne her şev.*

*Wel-lahî pir ecêb e hon vî malî dikin
kom;*

*Bê tac û bê sera ne , ji bo dijmin didin
hev.*

*Malê xwe tev bela kin , ji bo
serbestiya kurd;*

*Xwîna xwe tev birêje , ji bin destan tu
derkev. (1)*

Mirov bi xweristiya xwe ji koletiyê heznake, û milletê kurd bi xwe ji koletî û bindestiyê hez nekiriye, dixwaze herdem serbilind bijî, ji bo vê yekê, Cegerxwîn deng li welat dike ku kurd tevde li karin û xebata wan berdewame, û tu carî naxwazin ku wek berê bijîn:

*Em hemî yekdest bira ne , êdî kurd
navê sitem*

*Serbilind dê em bijîn tev şah û gavan
dem bi dem*

*Ger nejin em tev wekî hev ser xwe najî
ev welat*

*Rengê kevnare me navê , me divê jin û
felat. (2)*

Bê guman rêya serbestiyê diware, Seydayê Cegerxwîn helbestek xwe wilo bi nav kiriye, serbestiyê mîna şarekî li jora çiyê dibîne, ew çiyayê ha pîrr-

-bilinde, tev bi dar û kelem û şikêrin, û li hawîr zinar, teba, piling û şêrin, û li jêra wî çiyayî, kortal û newalîn, ango bindestî, dîlî û koletî ye. Dide xuyakirin bo kesê ku bixwaze li şarê azadiyê rûnê divê xurtemêr û gernas û wêrek be, wek karker û cotkarên ku ji dil û can dane ser vê rêyê, lê kesên qelsemêr û tirsok her ewê dîl û bindest bimînin, destnîşan dike ku karwanê xebatê bo azadiyê bi rê ketiye, îca çî jê re gereke...? mêranî, hevkarî, yekîti û hişyarî ji herdu tuxman "jin û mêt" divê bi hev re bi pêş ve herin û bê tirs şerê dijmin bikin:

Li jorê çiyê şarê serbestî, azadî, bihişt

Korta bindestî, newal dîlî, koletî li jêr

*Kerwan; kerwanê jin û evîn, kerwanê
xebat*

*Dane ser vê rê; karker û cotkar bi das û
bi bêr*

*Tirsonek berjêr, paş de direvin, kortala
dîlî*

*Gernas serbilind, cihê xwe digrin, li jorê
bajêr*

*Bi mêranî her bi pêş de bê tirs, ev e rîya
me*

*Destê hev bigrin, wek xuşk û bira, çî jin û
çî mêt. (3)*

Cegerxwîn bi hêrseke tund û bilind, doza dostanî û biratiyê dike taku li rojhilat bi cî bê, dide berçavkirin ku dema bindestiyê çû ye, ev dem dema serbestiyê ye, îca taku xelkên rojhilatê bi dilşad û dilxweş bê qêr û girî, bê hebs û zindan, bê zor û sitem û bindestî bijîn, divê ku ala dostanî û biratiyê lidarkeve û tev ji bo vê yekê bixebitin:

*Em ji xew rabûn welatim ez bi qurbanim
bese*

*Tev de rabûn rojhilatim sebr û samanim
bese*

*Ev dema serbestî ye, bindestî îdî çû
nema*

*Şad û dilxoş û bilind bim, hebs û
zindanim bese*

*Em hemî dost û bira bin da bibî bax û
buhîşt*

*Min ji nêv baxê cihanê bax û bustanim
bese. (4)*

... Dûmahîk Rûpel: 8

AZADÎ DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE

... Dûmahîk:

Nezanî û nexwendin ji nexweşiyên pîrr giranin, rêjeyek berfireh ji keç û xortên kurd ta niha jî nexwendene, lewra ew nexwendin û nezaniya berfireh yek ji sedemên ku hiştiye milletê kurd ji azadî û serfiraziyê bêpar bimîne, Seydayê Cegerxwîn jî serbestî û xurtbûnê di xwendinê de dibîne, îca rê dide ber millet ku bixwîne taku bi xurtî bigihê doza xwe û ji bin destan azad û serbest bibe:

Bixwîne da tu serbest bî, bi xurtî bighê doza xwe

Binêr her tişt li dinya yê wekî cenga Filestîn e. (5)

Cegerxwîn ji bo azadiya milletê kurd li komela mafên mirovan, dike gazî û qêrîn ku her millet bûne xwedî maf, tenê milletê kurd bindest û perîşan ma ye, û tu kes di hawar û gazîya wî de nayê, îca doza pêşrewiyê li jin û mêrên kurd dike ku tev bibin pêşrew û bixebitin, heger hinek bêne kuştin wê nîşên li pey wan serbest û azad bibin:

Komela heqqê mirovan, heqqê her kes daye wan

Dengê kurd kes nabihizî sed hewar û sed eman

Lê ji bo em karibin vî tiştî pêkbênin bi lez

Mêr û jin tev pêkve rabin rengê şêr û pehlewan

Gerçî hin em bêne kuştin ê dî wê serbest bibin

Wê bimênin ta ebed her dem ji bo me ev nîşan. (6)

Seydayê Cegerxwîn, bi sergulî evîndar û şeydayê azadiyê bû, lewra şoreşa azadiyê ya ku li ser destê karker û cotkar û palevanên Sovyet bi pêk hat, azadiya hemû karker û cotkarên cihanê tede didît, piştî xwe pê girêdida, pesnê wê û pesnê serokê wê dida, gelek hêvî jî li ser ava dikir:

Azadîperest hemî bûne yek

Me ling danî ser kumbeda felek

Sewra me ya xurt vî şêrê xwîndar



Xîstin destên me tev rêjîm û dar

Bûne weke hev serbest em dijîn

Tev pirolêtar, bijî Sitalîn. (7)

Milletê kurd navdar û serbilind û efraze, tu carî serê xwe ji dijmin re danexistiye, lê mixabin ji sedê salan ve bindeste, û dijî vê bindestiyê herdem dixebite, dehên serhildanan dijî neyar û dijminan lidarxistiye, ev milletê navdar û azadîxwaz, bê guman di qeyd û bendan de ranazê, Cegerxwîn ev tiştê ha tekez dike ku milletê kurd; gernasê dêrsim, agirî, barzan û soran, azadî û serbestiyê dixwaze, û ew pêşketina ku di vî warê de li cihanê çê bûye ji me re pişt û ronahî ye:

Em kurdin, kurdên navdar ser bilind û efrazin

Xewa me nayê li newalê kûr diqeyd û bendan ranazin

Azadî û serbestî û berxwedari li cihan tev

Pêşketîne, ev ji me re her û her daxwazin

Gernasê dêrsim û agrî û barzan û sordaşin em

Bermayê: - Mad, û Sobar û hemxakê Qewqazin

Qaremanê milletê kurd tev karker û cotarin

Dijminê koledar û dostê hevalên azadîxwazin. (8)

Dîs di vî warî de:

kurdin serbilindin, naxwazin bindestî

em azadîxwazin, divên tim serbestî

îdî em hestan

nîne rawestan

xencer bi destan

divên Kurdistan. (9)

Lê bi çî rengî emê welat ji bin destê dijmin rizgar bikin, û serbestî û azadiya xwe bi çî bînin..? Seydayê Cegerxwîn vê yekê di rêya rêz û rêzanî, yekîtiya millet, xwendin, hişyarî û şer û cengê de dibîne:

Kurdistana me ye, lê bindestê dijmin

Bi roz û rêzanî, divê ko em derxin

Êrîşe êrîş

Ey gelê kurdan

Divê em bigrin

Bi zor Kurdisatn. (10)

Millet bibî yek dest bavêjin çek

Bibim ser dijmin êrîşên mezin

Em wan bi dizin wek pez û bizin

Wan rê nezana bixin zindana

Leşkerim bazim azadîxwazim. (11)

Di bihevgerêdana navbera azadî û xwendinê de, dide berçavkirin ku xwendin rêya rast û dirust nîşanî mirov dike, di rêya xwendinê re mirov xwe û yê himber xwe jî nas dike, çavê mirov li ser gelek tiştan vedike, xwendin rêya azadiyê dide ber mirov:

Kes rê şanî we nadî

We jî navê azadî

Serbest nabin li dinê

Ko zor nedin xwendinê. (12)

Seydayê Cegerxwîn milletê kurd di herêmê de dost û birayê milletên dîtir dibîne, û miletan dijminê hev nabîne, belê dinere ku millet tev azadîxwazin û tev dijî zordestî û bindestiyê dixebitin:

Kurd û Ereb bira ne em tev azadî xwazin

millet divê serbestî, li her derî dibazin. (13)

Ev jiyana xweş û şêrîn ku her tişt lê hatiye afirandin taku mirov tede jiyaneke xweş, lihevhatî û bikêrhatî dûtir sitem û zorê, dûtir lédan û kuştinê, dûtir birçîbûn û hejariyê, dûtir hemû coreyên bindestî û zordestiyê bijî û bi çî bike, lê mixabin kesên xwînmij, şovînist, faşist û koledar nahêlin ku mirov wek hev bijîn, nahêlin wekhevî bi pêk bê, nahêlin millet serbest û azad bijîn. ... Dûmahîk Rûpel: 9

AZADÎ DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE

... Dûmahîk:

Di vî warî de, Cegerxwîn doza azadiya mirovan di cîhanê tevî de dike, doz dike ku hemî millet li ser qada xwe serbest û azad bijîn, doza azdadiya karker û cotkaran dike, doza wekhevîyê dike ku reş û sipî, mizgeft û kenîşt, jin û mêr, birçî û têr, tevde yeksane wek hev bibin, bê ciyawazkarî, bê zordestî, bê zorkarî, bê kuştin û talankirin, doza ku dezgeh têkevin şûna çekan dike, taku jiyaneke serbest û mirovperestî li cîhanê peyda bibe:

Ev av û agir, ax û ronahî

Ev dar û ev ber, hişk û şînahî

Hatin afirandin cîhan seranser

Da ko bijîn xweş, têde tev beşer.

Bela nemênin: - birçî û tazî

Carek nebênin: - hewar û gazî

koça xwe barkin: - kuştin û talan

Serbest bikin em, cotar û palan.

Ev cîhan xweşe, seranser bihişt

Yek so bibin tev Mizgeft û Kenîşt

Ol tev bibin yek: - mirovperestî

Rist tev bibin yek: jînek serbestî.

Çekan bavêjin- van çekên mêrkuj

Ji ser xwe rakin mirovên xûnmij

Dezge bi gêrin, ji bo dilşadî

Ji bo serbestî, gerden azadî.

Her yek di qada xwe de ser bilind

Bibin wekî hev tev bajar û gund

Serbest bijîn em, hemî jin û mêr

Bêtir dibin ev hebûn û ev xêr. (14)

Di helbesta " Serbestî û Bindestî " de, Cegerxwîn hin xalên giring û pêwîst di warê azadiya giştî de destnîşan dike, wek: azadiya gotinê, nerîn û ramanê, azadiya kesayetî, daxwaz, ger û kar..t.d.

Ev rengê ha ji azadiyê, ne tenê ji mirovê kurd re dixwaze, belê ji hemû mirovê cîhanê re doz dike:

Tu serbest bijî pir xweşe ev jiyân

Ne تنها ez û tu, belê tev cîhan

Tu serbest bibêje, tu serbest biger

Tu serbest bixwaze, tu serbest bîner.

(15)

Bê guman qelenê azadiyê buha ye, û xuya ye Seydayê Cegerxwîn ligorî-

rewşa milletê kurd û nobûn û harbûna dijminê zordest, dijî mafê vî milletî û dijî azadî û serbestiya wî, gihiştîye baweriyekê ku qelenê azadî û serbestiyê xwîne, îca azadî ligor nerîna helbestvanê me, wilo bi hesanî nayê dest û dara azadiyê bê xwîn şîn nayê:

Tu xwîna xwe birjêne serbest dibî

Divê rê çikûs bî tu bindest dibî

Tu serbestiyê wer hesanî mebîn

Hevîrek sitrandî bi rondik û xwîn. (16)

Şîn tê bi xwînê dara serbestî

Îdî naxwazin dîlî, bindestî

Ev êlperestî, ev olperestî

De rabe ser xwe, kurê min rabe !. (17)


DAWÎ:

Seydayê Cegerxwîn nerîna xwe bi rengekî gelemperî li ser bingeha felsefeya Markisî - Lenîni ava kiriye, zoredestiya ku li milletê kurd dibe bi zordestiya ku li milletê cîhanê tevî dibare girêdaye, ew zordestiya ku kesên Imperyalist û şovînist û faşist û koledar pê radibin.

Cegerxwîn, millet dijminê hevdu nedidît, belê didît ku millet tevde dost û birane, û millet bitevayî azadîxwazin, û doza ku her miletek li ser qada xwe bi serbestî bijî kiriye, lewra berê gelê kurd herdem dida kesên zordar û koledar yê desthilat di dest wan de ye, û dida berçavkirin ku ew kesana hov û xwînmijin, îca divê ku xwîn bê rijandin taku em ji bin destê wan azad û serbest bibin, û daye xuyakirin jî ku milletê kurd ne şerxwaz û dildarê xwînrijandinê ye, lê belê dijmin û neyar guh nadin doz û xwestekên wî, û bi aştî û peyva xweş û nerm nayê rêya rast û durist ku divê her millet azad û serbest bijîn.

Îca herdem milletê kurd hay dikir û ew radajot taku şer û cengê dijî dijminan lidarxe, ji alîkî dî ve, doza yekbûna miletan dikir dijî wan kesên xwînmij û koledar, û dilxweşî û şadiya xwe dida xuyakirin bo şoreşa karker û cotkarên welatê Sovyetî û serbestiya hemî karker û cotkaran di serbestiya wan de didît.

Seydayê Cegerxwîn, ne tenê şer û ceng mercên azadiyê didît, belê di ser re serbestî û azadiya milletê kurd, di xwendin, rêzanî, tektîk, zanebûn, hişyarî, yekîfî, tevger, kar û xebata roj û şevane de didît.



JÊDERÊN VÊ LÊKOLÎNÊ:

- 1- *Pirîsk û pêtî, Dîwana yekem, weşanxana Deng, 1992 Istanbul.*
- 2- *Sewra azadî, Dîwana duyem, weşanxana Deng, 1992 Istanbul.*
- 3- *Kîme Ez, Dîwana sêyem, sala 1973, Bêyrûd.*
- 4- *Ronak, Dîwana çarem, weşanên Roja nû, çapa yekem, sala 1980 Stokholm.*
- 5- *Zend - Avista, Dîwana pêncem, weşanên Roja nû, çapa yekem, sala 1981 Stokholm.*
- 6- *Şefeq, Dîwana şeşem, weşanên Roja nû, çapa yekem, sala 1982 Stokholm.*

TÊBÎNÎ:

- 1-Helbesta: Jibin destan tu derkev, Rû 20, D: 1em (Prîsk û Pêtî).
- 2-Helbest: Em ne kole ne, Rû: 115, D: 1em (Prîsk û Pêtî).
- 3- Helbest: Riya serbestî diware, Rû 298,299, D: 2em (Sewra Azadî).
- 4- Helbest: Giryanim bese, Rû: 312, D: 2em(Sewra Azadî).
- 5- Helbesta: Sitem dimrî bi hikmê dem, Rû: 314, D: 2em(Sewra Azadî).
- 6- Helbesta: Qey kurd ne Însan e, Rû: 317, D: 2em(Sewra Azadî).
- 7- Helbesta: Sewra Azadî, Rû: 362, D: 2em(Sewra Azadî).
- 8- Helbesta: Di qeyd û bendan ranazin, Rû: 26, D: 3em (Kîme Ez).
- 9- Helbesta: Naxwazin bindestî, Rû : 42, D: 3em (Kîme Ez).
- 10- Helbesta: Naxwazin bindestî, Rû : 42, D: 3em (Kîme Ez).
- 11- Helbesta: Leşkerim, Rû : 47, D: 3em (Kîme Ez).
- 12- Helbesta: ji xwedê divên û em firinga didin, Rû : 114, D: 4em (Ronak).
- 13- Helbesta: Em azadî xwazin, Rû : 33, D: 3em (Kîme Ez).
- 14- Helbesta: Em şer naxwazin, Rû : 129,134, D: 3em (Kîme Ez).
- 15- Helbesta: Serbestî û Bindestî, Rû : 59, D: 5em (Zend - Avista)
- 16- Helbesta: Serbestî û Bindestî, Rû : 59, D: 5em (Zend – Avista).
- 17- Helbesta: Azadîxwazim, Rû : 37, D: 6em (Şefaq).

GOMIK ... Dûmahîk:

-gomikên ava li ber malê gom bûbû diketin, xelek ji xelekê zêde dibûn. Ew gomikên li ser wî betonê ku li cadeya ber malê mina şiveke hezîranî ramedandî bû û ji ronkahiya lampeyên kuçeyê mîna bahrên bêbinî xuya dikirin, ew dixist tasewaseke mezin.

Piştî ku çend caran dûmana cixareya xwe kişand, bi tiliya xwe ya eşuhedê çipiska xwe li xweliya ku li ser wê dirêj bûbû xist.

Ziq li xweliya ku ji qatê heyştan heta bi nav gomikên avê dihat xwarê temaşe kir. Ew pirtikên ku li hewa ji xweliya cixareya wî diqetiyên, mîna kuliyên berfê ku ji valahiya ezmên veqetiyabin û bi nermahiya hevîrîmî bîn xwarê, xuya dikirin. Ji ronkahiya lampeyên rengsipî kuliyên xweliya cixareyê bi pêleke melodîk xwe bera xwarê dida. Ew li xwe hay bû ku xweliya xwe ji jorî de diavêje jêrî û ew dikare bikeve ser serê hin kesan. Lê kesek di wê seetê de li kuçeyê tune bû. Wî di dilê xwe de ji wan kesên ku dê di kuçeyê derbas bibin re çêr kirin û dîsa çavên xwe kutan nav wan gomikên avê ku hebên baranê lê dixist. Nema gulpek jî ji cixareya xwe kişand û bi wî awayî li ber sermayê sekinî. Bû wek textekî. Sar sekinî. Li jêrî nêrî. Xwe ji jorî de serserkî bera xwarê da. Pelçînî ji laşê wî hat. Li nav gomikekê ket û termê wî di nav wê gomikê de bê hereket ma. Wî ji jorî de li termê xwe yê kin î badayî temaşe kir. Pêşî zikê wî pê şewitî û li termê perçebûyî nêrî, paşê bi xof li wî gewdeyê qelew nêrî ku ew sedûdeh kîlo bû. Kir niçenîç û got, ' Ma çi li te qewimîbû, loo? Ma te çima li xwe weha kir ' Ji nişka ve kenîya. Kir hakeha û got, ' Xwelîser, tu ew qasî bêîrade bûyî, hiii? Ma hewce dikir? ' Li xwe hay bû ku agirê cixareyê gîhaşt tiliyên wî û xweliya li serê cixareya wî serê xwe bernixûm kiriye. Boçika wî li benda avêtinê ye. Wî careke dinê bala xwe da baxçeyê jêrîn û li bêhereketbûna darên hewr û îxlamûran nerî ku ew di bin wê barana bişidet de dibiriqîn. Pelek jî ji wan zer nebûbû. Ji rengê xwîna di nav gomika avê de, şexlên pelên hewran mohr dikir, yên îxlamûrê xirriqî bûn. Şaxên îxlamûrê xwe di ser wî termê ku di nav gomika avê de bû re tewandibû, ew nixumandibû... Ji nişka ve dengê gaziya pîrekan hat. Ew veciniqî...Ji nav daran derketin. Ew dengê hewara pêşî, dengê dêya wî bû. Dengê duduyan yê xaltiya wî û yê sisiyan yê xweha wî bû. Li pê wan jî zirbirek jinên serbikitan hebûn.Hemûyan dikir gazî û ber bi wî termî ve dimeşyan. Gulî û biskên xwe kur dikirin. Serçavên xwe qeremûşk dikirin. Bi humikan li sînga xwe dixist. Ew bi merasîm dimeşyan. Wî di pencereyê re destê xwe bi wan re kil kir û bang kir, ' We xêr re, we ilam e ? tiştekek nebûye, tiştekek nebûye! Va ye ez li vir im û ez sax im...' Berê wî ket dêya wî û paşê jî xaltîka wî. Xaltiya wî herdu diranên xwe yên zêrîn çûrisandin. Ew kenîya û xweha wî bi du dengên lîrand.

Wî xwe bi niv metroyê di pencereyê re dirêj kir û dilopên avê ji nav porê wî hatin xwarê. Ji ronkahiya lampeyan, dixana ku ji nav serê wî radibû, mina giyarekî ji nav mîja serê sibehên sibatê derketibe, xuya dikir. Berbûyên ku ber bi termî ve dimeşyan, gîhaştin bin daran.Hin kesan ji wan dilîrand û hin kesan jî dikir gazî. Wî fahm nedikir bê ew dixwazin çi bikin. Bi dengê hêla bang li wan kir, lê tu ji kê re dibêjî.Deng nediçû kesî.Ew hêrs bû û heta ku Xwedê qiwet dabûyê, bang kir, ' Hahooooooooo! ' Bi dengê-

-hahobûna xwe re, çeng bû ser xwe.Ew ji xwîdanê kumêt bûbû. Ser dilê wî dikir gupegup.Serê xwe kir nav lepên xwe û midetekê weha ma.Dêya min, miriye...Xaltîka min, ew jî miriye...Lê xweha min? Na, ew sax e û li welêt e...Xuya ye ku ew di tengasiyê de ye. Tiştekek bi serê wê de hatiye.Dibe ku mêrê wê tahdehiyê lê dike. Dibe ku ihtiyacek wê hebe. Ya jî ew nexweş e...Lê ew termê di nav gomika avê de? Ew rabû ser xwe. Çû rahişt telephone da li xweha xwe bigere, lê piştî ku li seetê nêrî û lê hay bû ku derengê şevê ye, telefon di cîh de danî. Çû li ber pencereya salonê sekinî. Xunaviya baranê dihat xwarê. Li baxçeyî nêrî, li wan gomikên ku ji ava baranê dibiriqîn, temaşe kir. Li cîhê ku ew termê qut î qalind lê bû, nêrî. Fikirî. Qedehek av vexwar. Cixareyek vexist. Du caran li ser hevdu dixan kişand û bera wê valahiya nav xunaviyê da. Hebên baranê mîna xencerê di nav perdeya dixanê re derbas dibûn. Tu deng nedihat. Tu term jî nexuyabû. Wî cixareya duduyan jî vênexist. Ji cadeya biniya malê dengê derbasbûyina erebeyan tev li dengê tipetipa baranê dibû. Ji nişka ve vegeriya nav livîna xwe û xwe ji wî dengê baranê ku xof jê re çêdikir, bi dûr xist. Di nav livînan de bêdeng ma. Destên xwe xistin bin serê xwe û çavên xwe girtin. Hewil da ku bi xew re here. Xewê ew negirt û hemû laşê wî dest bi xurê kir. Xwe qulipand vê hêlê,nebû. Xwe qulipand wê hêlê, nebû. Çend caran çû li lat û birekan geriya, vegeriya nav baxçeyan. Çû li serê Miskêr rûnişt û li herka avê temaşe kir. Li pezê bizinî û şîrdotina bêrivanan, li birkirina pezî û li ' ew, ew û tîrrest, tîrrest' a şivanan gudafrî kir, nebû... Hewiya wî di bin lihêfê de nehat. Laşê wî ji serî û hetanî binî xwê da. Dîsa rabû ser xwe û berê xwe da ber pencereyê. Dîsa çû li wî baxçeyî nêrî. Ewrê ku li ezmên girêk girêkî bûbû, xwe dida hevdu. Yekhebên baranê ji nav wan dihatin xwarê. Her hebeke baranê ku dihat xwarê û li nav wan gomikan diket, giloveleke wek sîniyeke sifirî çê dikir. Hejmara gomikên li ser wê cadeyê bûbûn bi dehan. Êdî niqtikên ku ji daran dihatin xwarê, bûbûn loqên mezin. Bêdengiya şevê bixof bû û şev kerr bû. Wî hinîşka xwe da ser betonê cemidî û çavên xwe li wê gomikê bel kirin. Baranê dîsa şideta xwe zêde kir û vê carê di hundirê gomikan de çenber ji çenberê zêde bûn. Rengê ava wan dîsa hate guhertin. Berê reş û paşê sor bû. Rengê xwîna jî nuh de lê da der. Her ku çû sewiyeya avê bilind bû û tu nemabû bigihîştta ber pencereya ku ew li ber bû. Termek bi ser avê ket. Lê ne ew termê qelew bû, ew dişibiya teyrekî. Serê wî yê însên, lê laşê wî bi perîk bû, bazikên wî û pepikên wî hebûn. Mirovî digot qey ew dike ji nav wê avê bifire. Bazikên wî vekirî bûn. Ew li ser dev vezelandî bû. Ew serê cimcimî ku bi wî termî ve bû, li ser hêla rastê heta bi nêviyê rûyê wî di nav avê de wenda bûbû. Çavê wî yê çepê vekirî bû. Wî xwest ku destê xwe dirêjî termî bike. Veciniqî. Li dora xwe temaşe kir û ji xwe re got, ' Ev çi ye? Hinek henekê xwe bi min dikin...' Destê xwe bi şûn de kişand. Li hêla xwe ya rastê û çepê nêrî, ' Çi ji min re, ev ne ez im...Dibe ku ev feq meq be ku hinekan li ber min vegirtibe. Xwe bi şûn de kişand... Bi vekişandina wî re, ew sewiyeya avê jî daket. Wek baloneke ku mirov ba ji ber berde...Ew termê hanê li hewa ma. Tam li hemberî pencereyê sekinî. Wî bi awayekî heyirmayî li serê wî termî nerî. Herdu çavên wî serê cimcimî vekirî bûn û ziq li hêla pencereyê dinêrî. Mizicî. Bi mizicandinê re bazikên xwe li hevdu xistin û bi hewa ket. Loqek zelq avêt û wîrîniyek jê hat.

DÎROKA HACKER'IYÊ Û HACKER'ÊN ... Dûmahîk:

-zarokane dihat hesibandin. Lê dîsa jî şirketên telefonan bi giştî karkerên jin didan xebitandin ku qazancên wan nekeve û kêmbê. Ji ber ku hê Hackireke jin tunebû.

DENGÊ KOMPÎTURÊ

Niha em werin sala 1960'ê ji ber ku kompîtur hatiye îcadkirin û ketiye jiyana zanîngeh û ciwanan, ciwan vê dahênana (îcad) rojane meraqê dikin û dixwazin pê mijûl bibin. Lê kompîturên vê demê ewqas mezin in ku bi tenê di saziyên fermî û zanîngehan de hene. Mînak kompîtura ewil li gor gotinan ji tonekî zêdetir e. Ji ber vê jî ji bo kompîturên berê dînazor dihatin gotin. Ev dînazoran di hundirê odeyên mezin de bi saya germahiyê dihatin xebitandin.

Li Amerîkayê di zanîngeha MIT'de (Massachusetts Institute of Technology) hin xwandekar û asîstan ji bo bikaranîneke hêsantir rêbazekê dîtin. Jê re berê Kurterê gotin paşê jî navê wê kirin Hack. Bi vî awayî kompîtur kirariyên pêwîst leztir û zûtir dikir. Di wan salan de, Dennis Ritchie û Ken Thompson pergala xebata UNIX'ê çêdikin. Pergala UNIX'ê ji kurterêyan pêk dihat.

GILGIL Û FÎQ

Sal:1971

John Draper kêşî kir ku promosyonên Cap'n'Crunch (xwarina gilgilê ye) 2600 mhz deng derdixe ku ev promosyon bi tenê fîqekê bû. John bi fîqê li ser awîzeyaya telefonê pif dikir û heta sibê beleş xeber dida. Draper vê rêbazê di demeke kurt de hînî herkesî dike.

Polês John Drapper digire û jê dipirse "Te çima vî karî kir" Drapper li polês dinêre û dibêje ku "Min malê xelkê da xelkê".

PERGALA TEXTEYA PEYAMAN

Sal: 1978

Randy Seuss û Ward Christiansen ji bo ragihandin û tîkiliyê pergalekê çêdikin. Navê vê pergalê dikin Pergala Texteyê Peyaman (Bulletin Board System). Êdî Hacker'in navdar an jî nûgihîştî hev nas dikirin û bi hev re dixebitiyan. Ev pergal hê jî di roja me de ji aliyê Hacker'an ve tê xebitandin.

KOMPÎTURA ŞEXSÎ

Sal:1981

Fîrmaya IBM kompîtureke şexsî çêdike û dide nasandin. Ev pêngaveke pir mezin bû û " bi şoreşa teknîkî " dihate binavkirin. Êdî perê te hebûya te dikaribû kompîturek bikira û bi kar biana. IBM vê salê pereyên pir mezin qazanc dike. Rêveberê IBM'ê wiha digot "Ev hê lêlê ye em ê lolo jî bibînin."

Dengê înternetê jî êdî hêdî hêdî dihat. Tora leşkerî ARPANET wê veguheriya bibûya înternet. Destên şirketan dixuriya wekî gurên birçî xwe avêtin ser înternetê.

FÎLMÊ WAR GAMES

Sal:1983

Hollywood dibîne ku Hackerî di nava ciwanan de pir populer e filmekî dikişîne. Navê film War Games (Lîstikên Şer) bû. Fîlm rekoreke mezin şikand û pir hat temaşekirin. Çêkerê vî fîlmî ewqas pere qazanc kir ku li gotarekê wiha digot: "Me bawer nedikir ku em ê ewqas pere qazanc bikin."

Lê rewşa herkesî ne weke sektora filmçêkeran bû. Rêveberê wê çaxê yê firmaya FORD'ê bi qehran daxuyaniyek dide rojnameya Times'ê dibêje ku "ev eşqa kompîturê karên me kuştê êdî kes erebe nakire."

KOMA HACKERAN-LEJYONA QIYAMETÊ

Sal:1984

Vê salê komeke Hackerî tê avakirin. Kom ji aliyê Lex Luthor ve tê damezrandin. Navê komê dike Lejyona Qiyametê (Legion Of Doom). Ev rêxistin ji bo Hackeran pêngaveke mezin bû. Êdî dema çalakî û xebatên hevpar û rêxistinî hatibû.

Ev koma Sîberî-online di dema xwe de pir navdar e. Hackerên herî baş di vî rêxistinê de kom dibin ev jî hikûmeta Amerîkayê dixwe tirsekî.

ŞERÊ NAVXWEYÎ

Piştî salekê di nava Lejyona Qiyametê de şerekî navxweyî derdikeve. Phiber Optik bi hevalê xwe Erik Bloodaxe ve şer dike û ji komê tê avêtin. Ev bûyer Lejyona Qiyametê parçe dike Phiber Optik komeke nû ava dike û navê komê jî dike Masters Of Deception (MOD).

Koma MOD xetên telefonan kilîdê dikin, xebirdanên hin kesian guhdarî û qeydê dikin, agahiyên şexsî didizin. FBI, Phiber Optik û 4 hevalên wî digire û dixwe girtîgehê.

ZAGONÊN DIJWAR

Sal:1985

Dewleta Amerîkayê ji bo astengkirina bûyerên Hackeriyê zagonên cur bi cur derdixe. Kongre heftayek li ser qanûnên nû dixebite. Êdî Hackerî tişteke zarokane nedihat dîtin. Yasayên pir dijwar hatin derxistin.

VÎRÛSA MORRIS

Sal:1988

Robert Morris bi kurmîkên înternetê (Internet worm) 6000 kompîtur hildiweşîne, dawiyê 10 hezar dolar cezayê pere dide û bi saetan jî di xizmeta civakî de dixebite.

Kevin Mitnick dikeve tora şirketê Digital Equipment Company'ê hemû agahiyên şirketê tevlihev dike û tê girtin ji ber vî salekê di girtîgehê de dimîne. Kevin Poulsen dikeve xetên telefonan piştî 17 meh şûn de ji aliyê FBI'yê ve tê girtin.

KGB Û ALMANAN

Sal:1989

Hackerên ku girêdayî komeleya Chaos Computer in dikevin pergalekê saziyên fermî yê Amerîkayê kod û agahiyên saziyan bi dest dixin û difiroşin KGB'yê. Êdî Hackerî bibû amûreke sîxuriyê. Ev bûyer ji bo operasyona Credux'ê bû bîngehek. Dewleta Amerîkayê derdiket nêçîra Hackeran.

... Dûmahîk Rûpel: 12

DÎROKA HACKER'IYÊ Û HACKER'ÊN ... Dûmahik:**OPERASYONA CREDUX'Ê**

Sal:1990

Hikûmeta Amerîkayê ji bo girtina hemû Hackeran operasyona Credux'ê pêk tîne. Operasyon li 14 bajêr pêk tê. Pir Hacker tên girtin. Lê ev operasyon dîsa jî encameke tegez nayne. Hackerî mîna nexweşiyekê di nava ciwanan de belav bibû.

Sal:1994

Vladimir Levin ji bo Mafyaya Rûsan dixebite û ji kompîturên Citibank'ê 10 milyon dolar didize. Levin piştî salekê di balafirgeha Heatrow'ê de tê girtin.

Sal:1995

Kevin Mitnick dîsa tê hepskirin ji ber ku 20 hezar heb kartên krêdiyê diziye. Dadgeh cara ewil Hackerekî bi kefaletê serbest bernade, Kevin bi salan di hundirê hepsê de dimîne.

BACK ORIFICE Û TROJAN

Sal:1988

Back Orifice ji bo Hackkirinê bernameyek çêdike û di konferansa The Cult of Death Cow (DefCon) de dide nasandin. Navê bernamê Trojan e. Trojan wekî sîxurekî diket pergala kompîturê û diziyê dikir. Ji wê salê heta roja me ev bername ji aliyê Hackeran ve tê bikaranîn.

Bername cara ewil ji aliyê Ehud Tenebaum ve tê ceribandin. Ehud dikeve pergala Pentagonê û kodên lêşkerî didize. Ehud bi salan di girtîgehê de dimîne.

VÎRÛSA MELISSAYÊ

Sal:1999

David Smith vîrûsekê çêdike û navê evîndara xwe dide bernameyê. Bi vîrûsa Melissa'yê dikeve pergala 300 şirketê û hemû agahiyên wan bi dest dixê û jê dibe. 300 şirket 400 milyon dolar zerar dikin. Piştî vê bûyerê Microsoft ji bo astengkirina êrişan bernameyên parastinê çêdike.

VÎRÛSA EŞQÊ

Sal:2000

Hackeran bi vîrûsa eşqê pergala malperên e Bay, Yahoo û Amazon hildiweşînin. Kodên bernameyên Windows û Office ji Microsoftê didizin.

CUREYÊN HACKERAN

Li gor pisporan 5 cure Hacker hene:

1-Hackerên Dibistanî: Hackerên dibistanî pergala internetê analîz dikin û hînî naveroka wê dibin. Di kirinên wan de tucarî zerardayîn tune. Armanca wan zêdetir zanistî ye.

2-Hackerên Jêhatî: Hackerên jêhatî zerar didin pergala malperan. Ew bi hilweşandinê xwe îfade dikin. Li dij hin tiştan hêrs û nefretên xwe wisa derdixin holê, bi giştî ciwanên nûgihîştî ne.

3-Hackerên Profesyonel: Hackerên profesyonel Hackkirinê bi tenê ji bo pere dikin. Dikevin pergala sazî û şirketan agahiyên wan didizin û difiroşin hin kesan.

4-Nivîskarên Vîrûsan: Nivîskarên vîrûsan bi kodan vîrûsan çêdikin û wan belav dikin internetê.

5-Hackerên Sîyasî: Hackerên sîyasî bi armanc û hedefên sîyasî tevdigerin. Li gor fikr û ramanên xwe çalakiyan pêk tînin.

HACKERAN JI BO ÇALAKIYÊN XWE KÎJAN BERNAMEYAN BI KAR TÎNIN

Hackeran bernameyên Trojan (RAT=Remote Access Tools) bi kar tînin. Em dikarin bibêjin ku nêzîkî 300 cureyên wan hene.

Ji bo xebitandina Trojanê sê parçe lazim e: Server, Client û Editor. Ev sê parçe saziya Trojanê pêk tîne. Parçeya Server deriyên pergala vedike, parçeya Client bingeha çalakiyê sererast dike, parçeya Editor çalakiyê pêk tîne. Îro di roja me de Hackeran zêdetirîn Trojanên Bladerunner, Deepthroat, Girlfriend, Schoolbus, Netbus, Subseven, Striker, Doly, Wincrasher, Voodoo û Netsphere bi kar tînin.

HIN HACKERÊN NAVDAR

-Adam Beberg: Projeya Cosm'ê çêkiriye.

-Dennis Ritchie & Ken Thompson: Pergala UNIX'ê ava kirine.

-Dmitry Sklyarov: Taybetiyên şifrekirina PDF'yê dîtiye.

-Douglas Engelbart: Bernameya Remailerê nivîsandiye û pergala NLS'yê çêkiriye.

-Ian Murphy / Captain Zap: Ketiye pergala telefonan û beş xeber daye.

-Johan Helsingus: Bernameya Remailerên Anonîm nivîsandiye.

-Kevin David Mitnick: Di cîhanê de çiqas pergala hene ketiye hundirê wan.

-Kevin Poulsen: Ketiye tora sazî û şirketan.

-Mark Abene (Phiber Optik): Prensîbên xebitandina telefonan keşf dike.

-Richard Stallman: Bi bernameyên taybet êriş kiriye kompîturê.

-Timothy Lloyf: Pergala şirketan hilweşandiye.

-Vladimer Lenin: Ji banqeyan agahiyên taybet diziye.

-Iskorpitx: Hackerekî nîjadperest û Tirk e. Malper û pergala çepgir û Kurdan hilweşandiye. Ji sala 2003 û heta roja me nêzîkî 30 hezar malper hilweşandiye. Çi ecêb e ku Iskorpitx hê jî nehatiye girtin!!!! Gelo çima!!!! Li gor pisporên Ewrûpayî Iskorpitx komekê ye.

Li gor lêkolînekê di dinyayê de Hackerên herî çalak Tirk in. Her sal bi hezaran malper û pergala hildiweşînin. Hackerên Tirk pirtirîn Trojanên Subseven û Netbus bi kar tînin.

DAWÎ Û ENCAM

Hin kes Hackeran qehremanên romantîk lê hin kes jî wan sextekar û bênamûs dibînin. Ji îcadkirina telefon û kompîturê heta roja me pir Hacker derketin û pir bûyerên Hackerî hatin jiyîn. Carinan Hackerî bi rûyê sextekariyê carinan jî bi rûyê siyasî derketiye pêşberî me. Lê divê em ji bîr nekin ku Hacker û Hackerî rastiyeke roja me ye. Ew ê herdem hebe.

Em ê bi gotineke Aldous Huxley nivîsa xwe biqedînin: "Hacker bi armancekê tevdigere hem romantîk e hem zalim e" Hacker dikare bibe şoreşgerekî an jî belengazekî"

KARİKATUR**Mihemed Seyda**

mihemedseyda@hotmail.com
(Swêd)

**JI GORISTANAN****GORA****DENGBÊJ****Hesen Adîk****LI GUNDÊ KORA****HERÊMA EFRÎNÊ****(1907 – 2007)**

Ev wêneya gora dengbêjê kurd û tenbûrvanê navdar Hesen Adîk (Apê Adîk - Bavê Henan) li gundê Kora herêma 'Efrînê ye.

HER ÊVARÊ**Osman Gulxwaz**

(Kobanî - Sûriya)
minar1993@hotmail.com

Her êvarê ez mêvanê mala we
me

Saxim yan mirî me
Di dilê we de
Zarokekî biçûkim
Di zikê dayika xwe de
Hatime kuştin berî ku ez saxbim

Her êvarê ez mêvanê mala we
me

Zarokekî biçûkim
Li ser riya dibistanê
Lal û winda me
Li zimanê dayika xwe digirim

Her êvarê ez mêvanê mala we
me

Zarokekî biçûkim
Di hembêza bavê xwe de
Li ber xeta cot raketîme
Û hîn ji xew şiyar nebûme

Her êvarê ez mêvanê mala we
me

Zarokekî biçûkim
Di zikê dayika xwe de kal bûm
Bê nav hatime veşartin
Her êvarê ez mêvanê mala we
me

**TABLOYÊN
DOSTANIYÊ (2)****Xada Siwêd**

ghada-swied@hotmail.com
(Şam - Sûriya)

**ROMANA LEHÎ**

Romana
Lehî,
romana
sêyenîn
ya
romanivîs
Firat Cewerî,
259 rûpel,
Sal 2011,
Weşanên
Nûdem.



ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN

Roman - Xelek (8) ©

Pîr RUSTEM

pir1963@gmail.com

(Efrîn - Sûriya)



- Axaftina te netewperestên Ereba tîne bîra min; hûn bi çavine girtî li dora xwe dinirin û ev bû pêncî salên Ereba ye ku, doza yekitiyê dikin û wan ti tişt bi ser nexistiye. Binir, ji roj roj de, konevanî bi kartêkirinê ve girêdayîye û ne tenê bi raman û baweriyên, lê mixabin me ev yeka fêr nedikir û me bi ewan meseleyan re dida û distand weke olperestekî û ne weke miletekî bindest ku, ew li mafê xwe digere û li gor dîtina me, di roja îro de, sûdeya me bi Emerêka û dostên wê re ye.

- Û di sistema cihanê ya nuh û golbalîzmê de ye. Her diçe Koçer qerfên xwe tûjtir dikirin, lê Kamêrên guhnedida ewê yekê û tê derxist ku, ev qerfên wî ji qelsiya helwestên wî tîne.

- Çima na; ka ji min re bibêje te çi ziyar ji ewê yekê ditiye. Tu ne bi min re yî ku, bidestxistina hinek maf ji tinebûn û konevaniya qirkirin û şewtandina ku, ewan sistêmên herêm, li seriyê miletê me dimeşînin, çêtire û ka ji min re bêje, îro bi xêra kê, pirsgirêka Kurd gihêştîye evê radeyê.

- Belê, bes ji bîra neke ku ew konevanî ji mera nuhin, lê ewên din di ewan rengan de û di ewê konevaniyê de pîrbûne û divê tu dîsa ji bîra nekî ku, kar û sûdeyên Emerêka û dostên wê, bi ewan rijîman bêtirî ewên ku, dê ji me bîn û wilo yek tê derdixe ku, ew tektîk dê pûç be. Ew lîskeke aşkereye û ew xwe nexopînin ku, ew rijîmên zorker, çavên xwe li ser ewê yekê damrandine. Di dawiyê de û weke ku, min berê jî gotibû: Heya tu karibî şerê segan bikî, gereke tu gur bî û di nivê şer de çê nabe ku, tu temaşevan bî.

- Ji bîr neke ku, Kurdên başûr, têra xwe xwîn rijandine û hine jî dirjînin û gereke yek înkâr neke û ji aliyê din ve jî û piştî hilweşandina Sovyêt, nîrîn û dan û standina bi ewan meseleyan re hatiye guhartin û îro, ji raja welatên bakurê ku, ew bi pêş kevin; helbet ne ji bo xweşikbûna çavên me, na, da ku ew bêtir û bi lez gavine nuh ber bi pêş ve bavêjin û ew weke çovan nekevin nav tîlên dolaba pêşketina wan. Koçer kûr bala xwe dide dîtînen wî û di kûraniya mejî de tîdighe ku, ew di nîrînen xwe de rast çûye, lê weke ku, yek li zirtiyê siwar bûbe, nedikarî zû-zû ji ewan baweriyên vegere. Lê tevî ewê yekê jî, wî hinekî helwesta xwe nerim kir.

- Min negotiye ku, wan xwîn nerijandî, lê di roja îro de, şerê bê namûs ji aliyê dijmin ve tê meşandin û çênabe em destên xwe têxin bin guhên xwe û em bibêjin; ti barî me li wê kerê tineye.

- Min nizanî ku, tu bûye destê PKK e. Wî xwest hinekî Koçer bihejîne; ka çiyê nuh dê derkeve.

- Min jî nizanî ku, tu bûye yek ji ewên boyexa wan di destê wan de û li gor dilê xwe yê din boyax dikin. Bila tu zanibî; eger ku, ez bi yekî PKK e re rûnim, dê bibêje min: "tu hevalê PDK êye, yan jî yê YNK êye". Carina ez ji xwe dipirsim: Ji bo çi, ew rijîmên zorker, evqas polîs, çavdêr û hêzên asayêşê peydakirine û ji bo kê û çima; hingî ku, ew şerê hevdu dikin, me ti caran wilo şerê wan nekiriye, de ka ew çima evqas pere û dem li ewan çêrokan mizaxdikin, bila me bi ser hevde

bihêlin, emê, di roj û şevê de, hevdu tine bikin û ew wilo jî dikin, rêça kal û bavan dajon. Bi gotina dawiyê re, Koçer bê dil-

-radibe ser xwe, da ku xwarinê çêbike.

- Ne gereke. Kamêrên dibêje wî û gava ku, Koçer lê dizivire, dibîne ewî rabûye ser xwe.

- Çi negereke. Koçer dipirse.

- Xwarin; dem derenge bûye û divê ez vegerim mal.

- Binir, eger ku axaftînen me êkê bihêlin em ji hevdu bixeydin, bila tu zanibî ku, ewê axaftina me ya dawiyê be.

- Na; tu baş min nasdikî. Lê Koçer naskir ku, tiştê bête çirîn dê nema bi perspanan nuh bibe, erê xwarina wan a bi hev re pîneyek bû, lê mixabin dostaniya wan riziya û her diçû gewra reşbûnê, di navbera wan de, firehtir dibû. Wî hîne ew çend pariyên ku, bi sarbûneke neşeartî dixistin dêv, daneqirtandibûn, xatir ji Koçer xwest û bi dilekî şikestî ji oda wî dertê, dihêle Koçer bi çavine sor li wî û sifra ku, li şûn xwe hêştibû binêre û tê bîrê ku, Kamêrên ji bo tiştêkî hatibû ba wî.

Piştî çûna Kamêrên, ew çend caran ji xwe dipirse; ka min çi şaşî di mafê wî de kirine û piştî ku, nagihe titiştî, ew dibêje xwe: "eger ku, em bibêjin; nîrîn û dîtînen min şaşbin jî gereke wî bi sîngêkî fireh bibîsta; çima ew kesekî konevane". Ev hevoka dawî dihêle ew hinekî berkenî bibe. "Ewî çiqas car di civat û axaftinan de gotiye; belkî ez û te, di nîrînen xwe de, neghên hev, lê ezê seriyê xwe bi ser ewê yekê dim, da ku, tu gotina xwe bi serbestî bibêjî û bi ser ewê yekê de jî û weke ku,

Elî bin Ebî Talib dibêje: Ez li ser rastiyê me heya em dighên û dibînin dîtînen min şaşin û yê din li ser çewtiyê ye heya ku, gotînen wî rast derdikevin".

Dema ku, Koçer dighe evê encamê, hinekî dilê wî rihet dibe û dighe ewê baweriyê ku, wî ti neheqî negihandî dostaniya xwe û Kamêrên; "Ew jî yê, rojeke, weke Keşe bighe ewê baweriyê ku, piştî em kumên şîn û sor ji seriyên xwe deynin, emê bibînin ku, seriyê me herduyan jî yê Kurdaye". Bi bîrhatina ewê bûyerê ji romana Kazantzakis, ew bi rûyekî melûl berkenî dibe û bi dengêkî bilind dibêje.

- Xûya dike, dê jîyan pir carên din xwe vegeirîne. Gotina wî dihêle Şêrîn, bi rûyê xwe yê li ken, di derî re derkeve.

- 8 -

- Ji kengî ve, ew gerdiş, bi te ketiye ku tu bi xwe re bi axêfî. Bi rûniştina wê ya li ser danîştoka herî bi tenê, ew dipirse.

- Tu jî ji kengî ve hînî ewê gerdişê bûye ku, tu ji piş deriyan ve li yekî guhdar dikî. Bi gotînen re wî çavek damirand.

- Ev bû demeke dirêj ku ew payîna çûna mêvanê te dikim, da ku, dakevim cem te; te bihîst çi bi Kalemêr hatiye.

- Na; ka emê çiyê din bibînin. Ewî, bûyera berî demekê, ewa ku hêştibû zaro di devê Ejdehadê wînda bibe, ji bîr kiribû û weke xewneke dûr, hinek tişt di bala wî de meybûn.

- Kalemêr ji nivî û bi jêrde pûç bûye.

- Heya bi du ew saxbû.

- Belê; Û min gotinek bihîst. Şêrîn di vir de dengê xwe datîne û riwê xwe nêzîkî yê wî dike û bi tirs dibêje wî: çêroka wî dihêle dilê yekî bikeve.

- Tu ewan çêrokan ji ku digirî. Dema Koçer jê dipirse, keçik hinekî şerpeze dibe û nizanê dê çi bersivê bide; nema tê bîra wê ku ew çêrok bihîstiye yan jî wilo bi wê re derket. Lê Koçer wê ji ewan meseleyan derdixîne, gava vedigere çêroka Kalemêr û li rewşa wî dipirse û ka çiyê nuh çêbûye ku, bihêle dilê yekî bikeve weke ku ew dibêje.

- Dibêjin ku Kalemêr li ser jehra wî dijîya û hertim ciwan dibû; ew gihêştîye sedsalî û hine jî weke xortan bû. Bi ewan nîrînen bi gûman ji aliyê Koçer ve, keçik lêvan gezdike û tê derdixe ku, bala wî ber bi ewan çêrokên kevin ve şimitî. Tiştêkî din jî bala wî kişand û hêşt ew berkenî bibe; "hîne kes maye û baweriyên- ... **Dûmahîk Rûpel: 15**

ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:

-wan bi cin û pêriyan tê". Lê dengê evê baweriyê di kûraniya canê xwe de jî dike û dihêle ew bi tirs ji xwe bi pirse; ka rastiya evê baweriyê heya bi kuderêye û heya bi kîjan pileyê akama wê li sinc û derûna wî dike.

- Çima tenê Kalemêr û ejdeha jiyana xwe bi hevdu diguhartin û ne kesekî din, mîna min. Koçer dixweze dilê wê biguvêşe.

- Tu?! Na.. Xwedê neke; tu hîne ciwane.

- Ma şer û mirin, bes bi ewên kalemêr re ye.

- Ez nizamim, bes tu na. Koçer naskir ku keçik ketî bin heyameke kûr û fireh ji dilxweziyan û gava ku, ew destên wê dixê nav ên xwe de, dinire ku ew dilerize, lê wî heya bi demekê nasnekir; ka ew lerezandin ji tirsêye yan jî ji dilxweziyên wê tê.

Dema ku wê berve xwe dikşîne, keçik bê berxwedan radibe û tê di nik wî de, li ser têxt, rûdine û bi xistina çena wê nav herdu destên xwe de, da ku, riwê wê bêtir nêzikî xwe bike, Koçer dibîne ku lêvên wê ji ser hev dikevin û diranên wê yên sipî dibirûsin.

Bi gihêştina lêvan ji hev re, heya ji wan tê ew xwe bi hevdu ve diguvêşin û demê ku, Koçer zimanê xwe têve dide hundir devê Şêrinê, keçik mîna zarokeke ku ji zûde memikê dê wînda kiribe û nuh ketibe devê wê, ew bi kerbeke tûj zimên dimije û dema ku, xwîna wan bi evê yekê sar nabe, Koçer bi milên wê digre û bi ser têxt de têxîne û bêyî ku, lêvên xwe ji yên wê derîne, destekî xwe jê re dike balîv û bi destê din jî pişkokên wê, yeko-yeko, dipişkuvîne.

Tiliyên wî mîna çiwîkên hec-hecikan ku, dikevin nav baxçeyan û ji gulekê difrin a din, ew jî ji memikekê dibezin a din û heya bi demekê lîska wan dirêj dike û gava ku Koçer, bi kişandina Şêrinê jê re û destgirêdana wê di ser piştê de, xwe di nav rehên wê de dibîne, dêv dixê sîngê wê û bi keleke tîr li seriyê memikên wê digere û bi girtina yekê ji wan, heya ji wî tê ew dimije, dihêle ku bihna şîr bi devê wî keve û ew tênaşê ka bi rastî şîr mêt an sibereke zarokiyêye.

- Hêdî-hêdî. Bi guvaştina ku ew xwe bi ser de diguvêşe dihêle ahîneke tenik bi Şêrinê keve. Ew jî bi porê wî digire û bêtir bi xwe ve diguvêşe, weke ku yek bixweze tiştê xwe yê herî biha di nava xwe de veşêre, da ku, çavên ti kesî din pê nekeve. Lê pir naçe û zendên wan li ser hevdu sist dibin û ew heya bi demekê bê liv û deng, di hembêza hev de, dimînin.

Bi rabûna Koçer, ji hembêza wê, dibîne ku dolemeya wê heya bi jorî kabokan kişiyê û ew hatiye civlandin, wî xwest jê re dîz bike û bi jêrde bikşîne, lê bi dest avêtina xwe re, ji ewê ramanê vedigere û dixweze tîbûna çavên xwe birjîne, lewre ew seriyê xwe datîne ser rihên wê û bihneke kûr jê dikîşîne; "Min hîne weke evê bihna te nekîr". Bi him-hima wî re Şêrin jê dipirse" Ka ew çî dibêje. Lê Koçer bi ramûsan û xwe tîmsdana di wê de, bersivê dide.

Koçer, di evê kêlikê de, baweriyên xwe bi Xwedê anîn û hêviyê tenê ji wî dixweze ku, zimberêka katijmêrê li ser evê kêlikê rawestîne. Lê dengê zaroyan di nêzikî deriyê wî de dihêle Şêrin rabe ser xwe û cendekê ku, diqîre di bin dolemê de veşêre, ew jî radibe ser xwe û ji odê derdikeve, piştî ku, leka pêntiron di bin kurtikê xwe de vedîşêre.

- Tu bi ku ve çû. Piştî ku, Koçer ji derve vedigere, Şêrin dipirse û bi nîrîn û kenê wî re, riwê keçikê sor dibe, lê hembêz kirina Koçer jê re û bi ramûsana ku, ji nav porê wê distîne dihêle ew bi dilovanî seriyê xwe têxe hembêza wî û destên xwe ji nava wî re bike gerden.

- Xwedê..! Çî bihneke xweş ji gewdê te tê. Wî got û riwê xwe bêtir têveda nav porê wê.

- Kela çayê çû. Şêrin dibêje û bi destên wî digre, da ku karibe bi wî bide fêmkirin. Lê titiştî nedikarî wê ji hembêza wî derîne û dema ku, Koçer radihêje tiliyên wê û radimûse, du hêsir-

-ji çavên Şêrinê tîn xwar û mîna ku, baran di nav qûmê de diçe xwar, ew jî di sîngê Koçer de wînda dibin.

Bi çûyîna kela ava di çaydên de û vemirtina paporê gazê re, keçik ji hembêzê bazdide û derçûna gazê dibire. Ewê hîngê çavên Koçer bi odê dikevin ku, Şêrinê text dîz kiriye û çaydan danî bû ser paporê.

- Destên te sax bin; ev cara pêşiyê ku ez xweşbûna çayê nasdikim. Piştî mêtina pêşî ji lêvên piyalê, ew dibêje Şêrinê.

- Ev pesin ji dil da ne an... Çavan bi nermî radike û dipirse.

- Na; Ji kezêbê ye. Ew bi kenê xwe re hinek çî bi ser xwe de dirjîne û dihêle ku, Koçer ber bi qutiya destmalên kaxezî bibezê û çendekan jê bikşîne. Wî bi boneya paqijkirina dolemê, herdiçû ew bi jor ve hildida heya ku, ew gihande jorî ewan kabokên befrîn û ramûsanekê, ji xala ku di nîvê kaboka çepê de, distîne û heya bi demeke dirêj li şopa fedibûna ku, di riwê xalê de dertê, dinire.

- Te çî tede dît.

- Jiyar.

- Yek, bi gotinan, bi te nikare. Bi gotinên wê re Koçer destên xwe dixê bin milên wê û piştî ku, ew li ser têxt rûdinê, wê jî, mîna ku dayik zarokê xwe hembêz dike, li ser çokên xwe datîne û bi hevoka ku, ew di guhê wî de dibêje; "Demê yek li te binire bawer nake ku, tu evqasî bi hêzî". Careke din, dêwê jiyarê di-ûre û careke dîtir, dibe zîrke-zîrka têxt.

Ji dema ku Şêrin ji ba wî çûye, ew bi evê ramanê mijûl bû; "çima li şûna ku, yek jiyana xwe bijî, ew direve felsifandina wê". Lê wî fikir-nedikir nikarî sedemên ewê yekê naskirina û dema xwest ji evê ramanê birevê, ew bi çûna cem Kalemêr dirame, lê gava dît ku, hinekî sist bûye, ew raman jî da şûn û gote xwe; "ezê êvarî herim ba wî". Ji berî ku, gotina xwe bi dawî bike û xwe têxe nav nivînan, ew ber bi tomargehê diçe. Dengê Şeyda dihêle zeviyêke gangiliyên sor, di dil de, bi pişkivîn û refê dûmeqesokan dîr biçe.

Bihneke nuh ji mitêl û nivîna wî dihat, çêja lêvên Şêrinê jî ku, di bin zimanê xwe de fikir, bi hezaran wêne û bîranînên dîr û nêzik di ber çavên wî re derbas dikirin û wî vedigerînin rojên zarotiya w û lîskên di hûnikiya şikeftan de. Û bi gotinên sitrana; "Dîlber heger te zanîba te çikiryê bi dilê min" re, dîr diçe.

Ew her roj di hundirê wê de kom dibûn û rojê bi lîskekê tîrên rokê vedimrînin. Her diçû lîskên wan jî bi wan re mezin dibûn û dihatin guhartin, îro jî di kûraniya şikeftê de li seriyên hevdu kombûbûn, kesî biyan nedixistin nav xwe; kur û keçên amên hevîn. Ew ji lîskên xwe yên berê tîr bûbûn û li lîskeke nuh digerin. Lê ji demekê û vir de ve, keçika amê wan xwe hin caran ji wan vedidizî û eger ku, yek ji wan bi ser ewê de biçûya, ew ji quncikê tarî derdiket û fikir ku ewê aveke xwe li wir dirjîne, lê ti carî çavên wan bi şopa avrijandinê, li şûna wê, nediket.

Îro jî û di ewê tenêtiya wê de, ramanek di çavên wê de dibirûse û piştî ku, vedigere nav hevalên lîskê, ew pêşniyarî wan dike ku lîskeke nuh bilîzin. Hertim gotin a mezina ye û gotinên wan li erdê namînin, ew jî ya mezin bû û zaroyên din li ser şopa wê dimeşin; "Gereke em lîskeke xwe ya nuh bibînin, bes em bi lîskên xwe yên berê listin, emê îro lîska bûk û zêve bilîzin".

Ew herdu jî amedebûn û ewê hertişt di seriyê xwe de rêzkiribû, deng li xûşka xwe dike û pir nedixwest ku, tev tîbighên, kuramê wan dê bi zave be; ew herdu di temenekî de ne û hertim bi hevdu re dilîzin û bi ser de jî çêdibe ku, ew li hevdu bîne mehirkirin.

Piştî ku, xwedîya ramanê, xûşka xwe dibe quncikê herî paqij û weke sewkiyekê, bi hinek nêzikbûn yek dikare bibêje: weke textekî, ji kayê çêdike û xûşka xwe li ser datîne, deng li zêve dike ku ew derkeve cem bûka xwe û- ... **Dûmahîk Rûpel: 16**

ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:

-ew jî bi boneya ku, gereke li şûna dê raweste û paçikê bi xwîn bibîne, xwe dide nêzikî ewî textî, da ku, ji ewî cihê de karibe temaşa wan bike û ji zaroyên din jî dixweze ku, ew derkevin û li derveyî şikeftê bilîzin û dengê stiran û lîliyan bibirin.

Herdu zaro xwe di ber hev re dirêj dikin û weke du cewrikan hevdu bihin dikin, keçik bi zikmakiya xwe ya mênî xwe li ser piştê dirêj dike û piştî ku, herdu bi derpiyên xwe digrin û ji xwe dişimitînin, Koçer dikeve ser sîngê wê û bê mêtina lêv û sîng, cewrikê xwe dixwe koza berxikan û pir naçe gewtinî bi wî dikeve û ava şor û şêrîn tevlihev dibe. Keçika din jî di bin ve diçe û heya bi demekê sergêjî dimîne.

Di dû re Koçer xwe li cihekî din dibîne; ew li hewşê rûniştîya û ji cihê ku, tede rûniştî; ji bin kevirê koşeyê xaniyê wan kaniyek der bûye û ava wê jî ber bi jêr, di geliyê Zompa wer dibe, dengê sûlavê dihêst ku, yek xwe bi dest wê de berde.

Ew di ewê xulmaşîya xwe de bû, dema dengê mêvanan ji gedûkê ve tê; roj roja Cejna Qurbanê ye û her çendekî hinek dihatin û hinek diçûn. Dema ku Koçer dike rabe ser xwe, lingê wî dişimite û ew bi sûlava ku di gêlê wer dibe re ber bi jêr dadikeve, ji berî ku ew di gola kevzê wer bibe û di nav keriyê reşan de cih bigre, ew dibêje xwe: "ezê çawa xwe bihêlm ku, ez di nav evê pîsî û qirêjiyê wer bibim".

Gotina wî dibe hêzeke canbaziye, radihêje wî û li ser kefa destên xwe datîne. Koçer, bê basik, di jorî geliyê Zompa re, di ser gund û baxçeyên hinar û sêvan re, di jorî rêlên merx û kizanan re difire, heya dighe qesreke ji ewên "Hezar şev û şevî" ku, di nav baxçeyên sêv û hinaran de avakirine û bi dîtinê dostê xwe; Tengezarê Qilîç yê wênevan û meşa wî ya hêdî-hêdî di ser rê û şivîleyên bêxêze de, ew dixweze dakeve cem wî, lê gava ku çavên wî bi rêza pût û peykeran dikeve, ew wê dixweziya xwe dide şûn û ber bi wan difire.

Koçerê Başûrî ji ezmanê xwe dadikeve û di nîvê xelesa pûtan de peya dibe, ji cihê xwe de li wan dinire; ew her yek Xwedayeke û ew tê derdixe ku, cihê lê rawestiyaye parêzgeheke kevine û ewî daketiye nîvê civata Xwedêyan û da ku, her yekî, ji wan, baş nasbike, ew bi çend gavan ber bi ewî diçû. Lê her ku nêzikî yekî ji wan dibe, ew di cihê xwe de dadirive û Koçer têderdixe ku, ev hemû Xweda ji mûmê hatine afrandin û bi tîna bawermendiya wî re, bi ronahiyê re ew têtin piştaftin.

Ew ji xew şiyar dibe ku, xwêdanekê tîr û zelqoyî ew pêçayî û çilpikên xwêdanê, ji enî û qirikê, darivîne ser balîvê wî û ewe ku, gunên wî naçirin. Bi lez ji nav nivînan dertê; êvar daketibû û ew bûbû pênc-şeş kat ku, di ser raketina wî re borî bûn, ber bi avrêjê dibeze û dema ku, deriyê wê vedike, laşê cerdûnekî bi darvekirî li şûna lempa elektrîkê dibîne.

- 9 -

Ji berî ku Koçer bê cem wî, Kalemêr xwest çayekê ji xwe re çêbike, lê nîvê wî yê pûç alî wî nekir, êşeke giran bi ser de girtî û du hêsirên bê şerm ji çavên wî diweşin. Ew dêt ji çêkirina çayê berdide û ewî ber bi kilîta radiyo dirêj dike; dengê bilûra ji berî azana şîva dihêle çend hêsirên din bêne xwar, ev cara pêşîya ku, dengê azanê dihêle ew bigrî û wî, bi heftê salî, bi şûnde vedigerîne; di demên ku bavê wî bi destên wî digirt û ew bi xwe re dibir mizgeftê, heya dighe ewê roja ku sola wî dizibûn û xas ji mizgeftê vedigerî; dizîya sola wî hêst ku çavên wî li ser pir tiştan vebin.

Piştî çend caran ji lédana derî, deng bi wî dikeve û Koçer derbas dibe. Rewşa wî, ji cara dawî ku lê bûbû mêvan û ta îro, pir li şûn ketî; cihê xwe ji koşê kişandî nîvê odê û li dora wî firaq, qirêjî û bihneke genî kombûye û Koçer dinire ku, yek kuvark jî di quncukên şil û tarî de derketine. Lê tenê, ewan tayên kefnîkê ku, hêştine çermê wî sipî bike, dihêlin made-

-Koçer di dêv de raweste. Ji dema ku, Agob li ber deriyê wî pûç bûye, nema Marî derdora Kalemêr paqij dike, tevî ku, li evê dawiyê, wê hin caran xwarin ji wî re dişand.

- Şev baş, te çima derî girtî; ne toz li derve heye û ne jî zivistane, da ku, yek xwe têxîne nav nivînan. Koçer got û li pencerê dinire ku, ew jî girtiye. Ev bi xwe jî cihê pîrsê bû; ewî qet pencere nedigirt, nemaze di demên ku, Şêrîn li mal ba.

- Tu dikarî derî vekî, xûya ye bihneke ne xweş bi ser min ketî. Gotinên wî dihêlin Koçer şerm bike û ji berî ku, ew zanibe dê çibike, Kalemêr parekê ji nivîna xwe vala dike, da ku, cihê rûniştinê ji wî re çêbike.

- Ev kengî wilo bû û çawa. Koçer bi gotinê re, dêt ber bi nîvê wî yê pûç dirêj dike.

- Ez ewê rojê sibê şiyar bûm û dema min xwest ku, ez rabim ser xwe, min dît ku nîvê minê jêr guhnade min. Di pêşî de min gote xwe, belkî ez xewnekê dibînim. Kalemêr bi dengê sar, weke ku li ser kesekî din dipeyive, dibêje wî.

Koçer di evan demên dawî de, sibê zû ji mal bi derdiket û pîrî caran ji nîvê şevê û bi şûnde vedigeriya mal ku, Şêrînê li benda wî ye.

- Ji berî a nuha ti caran êş neketibûyê.

- Belê; ji zû de, çî zû de, hema ez zaro bûm û li gor gotina diya min, carekê ez nesax ketim û nêzikî mehekê ez pûç mam. Tê bîra Koçer ku ew jî carekê wilo nexwaş ketibû û yek dibêje belkî ew li ser wî di axife.

- Bibore, ez hinekî dergam mam û weke tu dizanî, ez di evan demên dawî de li mal ne dimam. Koçer çavên xwe, ji ber ên wî, direvîne. Wî nedixwest ku wêneyên Şêrînê û derewan tê de bibîne. Te xwe pêşe ti bijîşkan kir.

- Çima bijîşk. Koçer, kûr, li gotin û dilsariya wî dimeyzîne; ew bê poşmanî û tirs li hêviya nefesa dawî rawestiya ye.

- Çawa çima. Gava ku ew dike rabe ser xwe, da ku, here û bijîşkê ku, li sere kolana wan, bîne. Kalemêr bi destên wî digre û wî dide rûniştin.

- Hûn xort xûna germin; dema ez hîne weke te xort bûm, bapîrê min gotinek gote min; erê, belkî ez li deştê neghêm te û tu karibî piştê li min û deştê bişkinî, lê ji bîra neke ku ezê di berkaşan de piştê li te û çiyar bişkinim û niha de ka rûne; ez dixwezim... Wî hîne gotina xwe bi serî nekiribû, deng bi derî dikeve û Agob dikeve hundir û nişkabûna hatina wî, cem Kalemêr, dide ser a ewên hevokên dawî ku, hêstibûn careke din jîyan û çêrokên wî yên xortaniyê bi bîr bîn û jiyana xwe di ya evî Kalemêrî de bibîne. Ti riyên din li pêş wan tinebûn ji bilî ku, ew ji nuh ve veşerîn çêrokên xwe yên berê û hîne ji berî wê rojê bi pîrî, təkeliya wan, mîna berê veşerî bû, bêyî ku ti kes wan nêzikî hevdu bike; ji bilî rîya dostaniya li pêş wan tinebû.

- Şeva we baş be, ez dikarim derbas bibim, bêyî ku pozê kesî sor bibe. Wî jî cihek ji xwe re, di ser mînderekê de, dît û rûnişt: "ez dibêjim vê carê jî rola te ye; divê her yek hefteyekê pûç, di nav nivînan de, bimîne". Gote Kalemêr û çavek ji Koçer re damrand; ewî xwest bi Kalemêr bide fêmkirin ku, carna canbaziya yê canbaz li seriyê wî werdigere.

- Ew nahêle ku ez herim û bijîşkekî bînim. Koçer dibêje Agob û kêzika ku, ew bi pana xwe diceliqîne, dengê xirçiniya wê dihêle madê wî bêtir rabe, nemaze ewê dengî dihêst ku bûyerke kevin bête bîra wî; çend û çend sal di ser re derbas bûbûn jî, lê her ku çavên wî bi bastirmê hêkan diket, kêzika ku di nav dirnên xwe de pelixandibû bi pariyê nên re, dihate bîrê û ew roje, ev roje ku careke din bêstirme têxe devê xwe.

- Ma bi kêfa wî ye. Bes îro yekşeme û ez bawer nakim ku, emê kesî bibînin, ezê bihêlm ku siba zû, Marî biçe û evê ku, di seriyê koşê de bîne. Agob vedigerîne û hatina Koçer weke keysekê dibîne, da ku, li Kalemêr- ... Dûmahîk Rûpel: 17

ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:

-zorbikin û ew bihêle bijîşk li wî binire; wan çiqwas bizav kiribûn ku, ew biçe ba bijîşkekî, lê hertim ew bi serhişkiya xwe de diçû.

- Ewê Ermen, eger ku ew nasbike û helbet dê bi xêrza te be, ez kesekî Kurdîm, ne dûre ku ji qehra cewrikekî re, ew tola xwe di seriyê min de biteqîne û derziyeke jehrê bi min vede. Kalemêr bi niv êjdilî dibêje Agob û çêroka ewê Bijîşkê Ermen ku, ji bo xatirê cewrikê xwe yê ku, li ser destê hin zaroyan hatibû kuştin, nêzikî heftê zaroyên Efrînê kuştibû û wî digot; min hîne tola cewrikê xwe hilnedaye.

- Tu bi min re nabinî ku, wilo ewê raja te bike û te zû ji nav lepên Ejdeha û Ezraîlan derîne. Gotinên dawiyê hêştin ku çav di seriyê hersiyar de gulok bibin. Û eger ku em karibin tola xwe hilînin, emê ne ji yekî weke te ku, ketî nav nivînan û li benda mirinê mayî, bistînin. Agob dixwest şopên hevoka çûye winda bike, lê her diçû ew bêtir di golê werdibû.

- Netirse, ez bê te naçim. Ma ez û kêyê emê, li wê dinê piyalan li hev xînin. Kalemêr vedigerîne.

- Hevalên ku ji berî te çûne û di biroşa herî mezin de bi cih bûne, pirin. Tu tenê jê mayî. Agob dibêje û kenekî sar, ji nav diranên amanet, diweşe.

- Ez carna dibêjim xwe; xweska roja din û dojah û buhuşt heba, hema evê baweriyê, dê bihêsta hêviyek li ba yekî çêbiba ku, eger yek li evê dinê negihêşt daxwezên xwe, ewê li wê dinya din bighêje ewana. Gotinên Koçer, bêdengiyêke fireh li dû xwe dihêle û herdu kalemêr, çend caran, li çavên hevdu dinirin.

- Te bi evê yekê nerind kir; erê em ne mele û keşe ne, bes di dawiya dawî de, dive baweriyê yekî bi hebûna Xweda û hatina lawê wû û pêxemberan hebe. Agob li Koçer vedigerîne û di qorzîka çavan re li Kalemêr dinire, da ku, erêkirina wî jî bistîne, tevî naskirina xwe ji baweriyên wî re.

- Çima ev pêwîstî, çima divê hebe.

- Ji ber ku ew rastiyeke û ti kes nikare dijî evê yekê biçe. Ji roja-roj de û pêximberê li dû yekî, ev rastî daniye ber me. Agob gotinên dawiyê nîşanî Kalemêr kirin, lê careke din deng bi wî nakeve.

- Em bêjin ku gotinê te rastin, bes tu ne bi min re ye ku, her pêxemberê Xwedayê xwe, bi rengekî cuda, daye nasîn. Ji Kehên Someriyar de bigre û heya em bighên Ola Îslamê, tu yê bibînî ku bi hezaran Xweda hatine û çûne û her yekî ji wan, li gor heyam û rewşa wê civak û dîrokê hatiye afirandin; angû û ji ber ku, Cihoya ji pêş Ferewin bazdida û ji bo rewşa wan a bindestiyê, Xwedayek bi wan gerek bû, da ku, di şer û cengan de alî wan bike. Lew re tu dibînî ku, Yaho weke lehengekî şerker e û emê bibînin ku, piştî ew bibin xwedî destlatî û zordariya hin çîna li ser ên din pir bibe, dê civakê bi hewceyî yekî mîna Yeso be ku, Xwedayekî dilovan ji ewana re bîne holê, da ku, civak karibe li ser piyan bimîne û jiyar berdewam bike.

- Bes tu baş dizanî ku, ewên din, Xwedâyên xwe bi xwe çêkiribûn û weke ku ji te neşeartiyê, wan pir caran ji kêvir an jî ji xurmeyan çêdikir û eger ku, yek ji wan birçî biba, wî Xwedâyê xwe duxar. Lê piştî wan çar pirtûkên heq ku, daketine. Koçer xwe nagre û gotina wî dibire.

- Çima tenê ew pirtûk dê daketibin û ewê jî ne weke yên Kevin bi destên xwediyên wan hatibe nivîsandin. Û ne weke wan digot ku, ew ji ba Xwedê de hatine û eger ku, em gotina wan bawerkin jî, tu dikarî bibêji min; ka pirtûka çaran.

- Ez nizanîm, bes weke ku me bihîstî; pir Xwedê hebûn. Lê bi daketina Tewratê re, me Xwedâyekî bi tenê naskir.

- Ev jî nerastiyeke dîtire; weke ku hemû jêderên dîrokê dibêjin ku, hinek olên ji berî Tewratê jî hene ku digotin: Xwedê yeke. Gotinên wî dihêlin ku, Agob bi awayekî behitî bipirse.

- Olin ji berî yên asûmanî.

- Belê û em dikarin Ola Atûnî ya ku, li ser dema Axnetûnê-

-çaran hatibû, weke nimûne binin û heya ev yeka; yekane Xwedê, di ola Zeredestiyê de jî heye û hîne E. Tiwînbî dibêje: Zeredestê ê yekem bû ku, bang li yekaniya Xweda kir. Ew dibêje: ku piştî şerê Ehrûman û Ahoramezda, di çar qonaxên xwe re derbras bibe û di dawiya ewî şerî de, Ehrûman dê bişke û Ahoramezda yê Xweda dê bi ser keve, tevî ku, ew herdu hêzên şer û xêrê ne jî û ji yek derûnê derketibûn.

Zaredest ne tenê wilo gotî, lê ewî heya bi roja din, dojah û buhuşt jî di hozanyariya xwe de bi navkirî û hêştî ev olên ku dibin navê asûmanî de têne naskirin, li ser rêçika wî bimeşin.

- Eger ku wilo be, çima ev olên tu dibêji jî neketin nav ên asûmanî. Agob dipirse.

- Hin rêvebirên olî ewan olan weke yên asûmanî dibînin, lê pirek ji wan evê yekê napejirînin û di nirîna min de, tişteki tenê dihêst û dihêle ku, ev hersê olên, bi asûman, hatine naskirin, bi hev re bêne girêdan, ew jî; nijada Samî ye ku, ew bi xwe cihê gûmanaye û evê yekê hêst ku, Mihemed bi wan tenê bawer bike, da ku, evan êl û milletên bi navê Samiyar têne naskirin nêzikî hev bike û ji aliyê din de jî, çî milletên din jî hebin, di hundirê wan de bêne piştaftin û em dikarin li evê têgêştina wî binirin, weke zanyariyeke kovarkiyê û bêyî ku, ewî zanîbû, ewî bingeha nirîna û dîtineke nuh dantîne û piştî sedê salan, nirîna û dîtîna wî, dê bêne vekolan û li ser ewê yekê, ev nirîna nijadperest, dê rabin. Li gor dîtina me, zanyarî û têgêştina Mihemed di vir deye û ne weke ku, dibêjin; Serketina zimanê Quranê hêst ku, ew bibe ji kesên herî li pêş. Di dû evê dengkirina xwe ya dudirêj re, Koçer dêt davêje pakêtê, lê dengê Kalemêr dihêle destê wî û ji berî ku, cixarê bikşîne, raweste.

- Bes di vir de te tişteki ji bîra kir; weke ku em dizanin, bêtirî carekê, Cihoya û Îslama şerê hevdu kiriyê. Cara pêşî bû ku, Kalemêr dipeyive.

- Tu cihekî pir mezin didî zanyariya Mihemed; ew li cihê lingekî xwe, di nav civata bazirganên bajarê Mekê de, digeriya. Lê di dû re çêroka wî mezin dibê û ji dest wî derdikeve. Agob jî nirîna xwe dibêje.

- Gotinên we rastin, bes hûn dikarin ji min re bibêjin ku, wî kengî dest bi şerê Cihoyên dora xwe kir; piştî ku nema karibû xwe ji wan û fûtên wan biparêze û tiştê din û ew a pêwîst û bivetire; gereke yek şerê hebûn-tinebûna olekê, ji şerê li dijî hebûna hinek kêmasiyar di hundirê olekê de, derxe û ewan herdu şeran weke hev nebîne; cudahiyeke mezin di nav van herdu şeran de heye. Şerê Mihemed bi hemû olên din re, şerê hebûn û tinebûnê bû, lê bi evan dudiyên din re, şerê wî bi hin tiştan re bû û bi ew kesên ku, li gor dîtina wî, ji riya rastiyeke derketibûne re bû.

- Ez dibêjim tu hinekî durrî rastiyeke diçe, tevî ku, pir tiştên te gotine rastine jî; lê hema em bibêjin: Cihoya bûn ên ku dest bi şerê Mihemed kirine, dê gunehkariyeke dîrokî be di dermafê Cihoyan de; em tev dizanin ku wî di destpêkê de û heya ku, li ser lingên xwe sekinî, ne tenê şerê Cihoyan nekir, lê şerê ti ol û êlan jî nekir û pirî caran pesna wan dida. Lê piştî ku darê wî hinekî qert bû, ewî dest bi şerê yên nêzik kir û her diçû xelesa şerê xwe fireh dikir. Lê mijara me ne ev bû; me li ser cudabûnên ku di navbera olên asûmanî û yên berê de dengdikir û di vir de yek dikare bibêje ku, pir kêmasiyên olên Kevin hatin tinekirin. Agob hinek gorepanin nuh bi dest xwe dixê û dihêle Koçer bi rûmetgirtineke bilind li wî binire û ji Kalemêr re jî, cara pêşî bû ku, têdighe Agob yekî ne riye.

- Weke çî. Koçer dipirse.

... (Berdewam Dike) ...

WÊJEYA KÛRÎ ... Dûmahîk:

Park Kyong-Ni

-serdemên nûjen de berferehbibe.

Sê şaneşîn û Silla¹ ya yekgirtî:

Mînakên herî pêşîn yên ku mane ji wêjeyê, ku di jêderên Kûrî de xuyadikin, dibêjin wan *Hyangga* (sitranên welatî), ewên ku ji teqalîdên wêjeyeya devkî ya kevnar derketibûn û di xwe de rengvedanên olî û gelêrî wergirtibûn. Hew 25 *Hyangga*, çêkirina hinekan bixwe vedigere pêşîya sedsala 6^{an}, dihête nasîn ku ta niha mane; 14 di tekistekî dîrokîyî pêşîn hatine parastin, *Samguk-yusa* (Bîranîna Hersê Şaneşînan, 1285).

Bûdîzim di serdema *Silla ya Yekgirtî* bûbû sistema ramanyariyê ya serdest û bandoreke xurt li ser wêje û hunerê meşand. Di heman demê de, hîlbûna *Konfoşîzimê* bikaranîna *Çînî* wek zimanê wêjeyî hêvojt û xwendina bi kilasîkên *Çînî* li pêş xist. Core-helbesta bi navê *Hanşî* - ku bi *Çînî*ya kilasîk hatibû ristin û dabû pey pîrensîpên *Çînî* di helbestê de, lê Kûrîyan nivîsandibû - di navbera bijareya wêjeyîya *Silla ya Yekgirtî* baş belavbûbû.

Koryo û Çoson

Bûdîzim berdewamkir ku bibe bandorekî sereke di pêşketina wêjeyê ya serdema Koryo. Di 1236^{an} de Padîşah *Kojong* yê torina desthilatdara Koryo ferman da oldarên Bûdî ku karekî tomarkirinê bibin ser hemî qanûna *Mahayana* ya Bûdî (danhevek ji sûtira² û name û ravekirinên bi navê *Trîpîtaka*) ji bo parastinek xudane peydabike dij êrîşên *Muxulan* ku ji başûr dihatin. Di rêya bikaranîna awayên teqlîdî yên kevirên çapkirinê, oldaran ew tekist bi tîpên *Çînî*- bi rengekî bel -li ser zêdetirî 81,000 qalibên textînan kolan, ku gihiştin 6,791 pelgî. Îro danhevka resen, ku dihête hesabkirin berhema herî temam ji *Mahayana Trîpîtaka* di cihanê de, di perestgeha *Hayinsa* ya Bûdî li başûrê *Kûriya Başûr* dihête parastin, û qalibên text hîn ji dihêtin bikaranîn ji bo çapkirina tekistên pîroz.

Wêje giringîyêk pêşveçûyî wergirt di serdemên Koryo û Çoson de, wexta fermanberên sivilî xwende-bi navê *yangban*-şûna bijareya serdestî mîratdar girtin. Di 'urfa *Konfoşîzimê* de, *yangban* di rêya ezmûneke netewî de, ku şarezayîya wêjeyê tevî tiştên din dixwest, dihatin hîlbijartin. Karên wan piranîya wêjeyîya Kûrî ya tomarkirî avadike ji serdemên Koryo û Çoson.

Sîjo, helbestek sitranan bi gewdekî sê-parçe sade lê hîn ji têkhelkêşayî, di pêşîya sedsala 13^{an} de derket, di serdema Koryo de, û paşê di serdema Çoson de geşbû. *Sîjo*ya pêşîn ku bi navê *tanga* (sitrana kin) hatibû naskirin îdiyalên *Konfoşîzimê* anîbûn ziman ew jî di rêya bikaranîna hin naverokan ji xwezayê. Lê nimûneyên paşîn elementên wek devavêtin û henekan di xwe de bichîkiribûn. Ji helbestvanên *sîjo* yên navdar *Hwang Çîn-Î*, cêrîyek xwende ya koçikan ji sedsala 16^{an} ku wek helbestvana Kûrî ya yekemîn dihête hesibandin, dibêje:

*Xwezî min gewhera vê şeva tarî ya nivê zivistanê girtiba
Û nava hênîkbûna livînên heyva buharê bi nermî pêçaba
Û min bi hezkirin vekira şeva dilberê min vejeriya*


û *Yun Son-Do*, ku hostayekî wî rengî bû ji 1587 ta 1671 jiyabû. Mînak:

Tu sipirsî, çen dostên min hene? Av û kevir, sinober û bamboo

Heyva li ser kaşên rojhilatê hilatî, hevalekî rûgeşe

Ji bil van pênc hevrêyan, ez dê çi xweşîyên din bixwazim

Nivîsandina *sîjo* ta sedsala 21^{an} berdewamkir û, ew jî wek *hayko*³ ya *Yabanî*, navdarîyek navnetewî wergirtiye.

**Serdema Nûjen**

Di serdema nûjen de, ji pêşîya sedsala 20^{an}, nivîskarên Kûrî adaptekirinek anjî guhertinek dane ser gelek bandorên wêjeyî cuda yên Rojavayê - nexasim rîyalîzim û mezheba wucûdî û suryalîzim - ku bi vê bizavê dê bikaribin rêzek ji tecrubeyên navnetewîyî zehmet bînin ziman: tecrubeyên wek desthilata *Yabanî* ya dagîrker, û perçekirina Kûriya û pişt wê re *Şerê Kûrî*, digel serdemek ji desthilata faşistî. Yek ji encamdanên herî giring yên wêjeyîya Kûriya nûjen ewe destana ji 16 pirtûkan, *Tojî* (bi wateya Xak), ku *Park Kyong-Nî* di demek dirêj de zêdeyî 25 salan (1969 ta 1994) nivîsandiye. Ev kar nerîneke berferehî jîndar ji Kûriya re, ji dawîya sedsala 19^{an} ta nivê sedsala 20^{an}, pêşkêşkeriye.

* *Wergerandin ji Ingilîzî: Xiyas Hisên*

Jêder: Microsoft Encarta 2007.

1- *Silla: Şaneşînen Kûrî yên netewî di sedsala 4^{an} de, dema bandora Çînîyan li ser Kûriya sistbû.*

2- *sûtra: pend û şîretên Bûdî.*

3- *hayko: rengê helbesta Yabanî, bi kurtbûn û dualîya xwe navdare, ji sê malikan pêktê.*

HEVPEYVÎNEK LI GEL NIVÎSKAR SALIH DEMÎCER



Hevpeyvîn

Imer Kalo

imerkalo@yahoo.com

(Kobanî - Sûriya)



-xwe de li zanîngehê bidomîne, lê ji nû ve xwendina xwe ya bilind berdewam dike û ew ana xwendekarê Zanistên Siyasî li zanîngeha Lubnanî ye, di ciwaniya temenê xwe de xwedî prensîp û dilhezê çand û ziman û pirsra gelê xwe bû, di nav nîfşê xwe de ji xortên jîr û çalak bû, ji bilî warê ziman û wêjeya kurdî bi tevgera siyasî ya kurd re jî li Sûriyê karkiriyê.

Salih di dawiya salên 80 î de fêrî zimanê kurdî bûye, û bi rengekî neyî eşkere mamustayetiya fêrbûna zimanê kurdî li herêma Kobaniyê kiriyê, di zivistana sala (1991) an de mamustayê min bû û ez li ber destên wî fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî bûmêl.

Demîcer bi ziman û helbesta kurdî dest bi nivîskariyê kiriyê, paşê berê xwe daye celebêkî ji helbestê cuda û çîrok bi zimanê kurdî nivîsand û du berhem pê afirandin, bi zimanê 'erebî jî gotarê dinivîsîne.

Berhema wî ya yekem di sala (2002) an de li bajarê Beyrûtê bi navnîşana Sozne Ji Berfê ku bi van 14 çîrokan çapkiriyê:

1- Têkçûna kurdo 2- Sozne ji berfê 3- Tûrê reş 4- Bêhnek zelalî 5- Gulê û payizeke zer 6- Raportên mirinê 7- Şêx pîroz 8- Çinar 9- Çîroka mirîne şewitî 10- Mirineke hemdemî 11- Kuştiya ramûsanekê 12- Xewna dilo 13- Zozan li benda min nema 14- Karê mezin.

Berhema wî ya duyem di sala (2006) an de - Taybet - bi navnîşana Dilkoçerê Sirûcê ku bi van 11 çîrokan çapkiriyê:

1- Te baş kir 2- Siyek 3- Deşta dilkuj 4- ez lawekî dixwazim 5- Agirên pir 6- Biratiya ji alîkî de 7- Çend xewn û maniyekê 8- Kêlê behaneyan tije nabin 9- Bidê medê 10- Xwekustîna bavekî 11- Dilkoçerê sirûcê.

Demîcer di sala (1996) an de ji ber tunebûna derfetên karekî ku pê debara jiyana xwe bike; berê xwe daye welatê Libnanê û ji wê salê de li bajarê Beyrûtê bi cih bûye, ew ji sala (2008) an de wek nûçegihan û amedekar û pêşkêşînerê bernameya Dawn Town di Kurdistan TV li Beyrûtê kar dike, ji sala (2010) an de ew ji ber sedemên siyasî nikare derbasî welatê xwe Sûriyê bibe .

JİYANA KESAYETÎ

Imer Kalo: Win di derbarê jiyana xwe ya zaroktiyê û êş û hesret û şahiyên wê qonaxê de çi dibêjin?.

Salih Demîcer: Kak Imer, di destpêkê de ez dixwazim sipasiya te bikim ji bo vê pêşgotina nîrxdar, hêvîdarim ku ez di wî cihê de bim û hêjayî hezkirina kesên dilsozên wek-

-te bim. Bi rastî dema mirov behsa jiyana zaroktiyê dike, yekser zelalî û bêgunehiyê tê bîra wî ,dema zarokan ji keder û êş û keseran re nîne. Jiyan di têgeha zaroktiyê de wekû xwe tê pejirandin, ji ber vê yekê hemû êş û hesret û dijwarî di wê qonaxê de çavnas dibin, û dan û standin bi wan re tê kirin, wek qedera li eniya jiyane. Lê dema mirov mezin dibe û hewil dide ku wê qederê biguhêre, kêşe û problem derdikevin holê. Min jî wiha kir.

Şahî bi wateya xwe ya ku em niha di vî temenî de nas dikin, wê demê di jiyana min de nebû. Lê ez dikarim bêjim pêxwasiya min şahî bû, kerasê min î qetyayî şahî bû, bazdana min a li dû piskilête hevalan şahî bû. Min wek zarokêkî gelek bêparî dît lê ez tu carî bi nebûna şahiyê hest nebûm û eve bi dîtina min xweşî û taybetmendiya qonaxa zaroktiyê.

Imer Kalo: Jiyana zaroktiyê di gêdûkên gundê Şêranê de, ta roja îro çi lîsk û bûyer û dîmen û kesayetiyan balkêş di bala we de mane?.

Salih Demîcer: Ez bawerim çiqas guhertin çêbibin û ez sed salî jî bijîm, wê zarokiya min ew qonaxa herî cuda û taybet be di jiyana min de. Bê guman ev jî ne tenê vedigere zelalî û bêgunehiya wê qonaxê, belê ew vedigere dewlemendiya wê bi lîsk û serpêhatî û karekterên taybet, û her wiha guhertinên mezin ên ku di wê demê de çêbûyî û ciyawaziyeke mezin xistî navbera zarokiya me û ya nîfşê li dû me. Wekû nimûne, di zarokiya xwe de min bi xwe biryar da ku ez bixwînim û bê yî ku haya dê û bavê min jê hebe, ez bi hevaleyê xwe re pêxwas derbasî dibistana gund bûm.

Û gelek bûyer û dîmenên wiha di zarokiya min de peydabûn ku ez bi xwe roja îro li wan matmayî dimînim û wekû tiştên `entîke bi bîra xwe tînim.

Imer Kalo: Qonaxa xortaniya we çawa bû, ango we dema xwe çawa derbas dikir û we dixwest win çi bikin û bibin çi?.

Salih Demîcer: Herçendî ez hîn pîr nebûme ta wê radeyê ku ez behsa xortaniyê wekû qonaxê buhurî bikim, lê ez dikarim bêjim me gelek hêvî û xewn û pilanên mezin di destpêka wê qonaxê de ji xwera danîn û kirin wek piroje ji bo pêkanîne. Lê mixabin piştî demê ne dirêj me nas kir ku pêkanîna wan zore û hêviyan me ji me mezintirin. Geşbîniya me têra welatekî dikir, ji xwe me pêşbîniya avakirina kurdistanê azad û serbixwe di nîrê çend salan de dikir û me ji bo vê dozê kar dikir, me xwendina xwe bi cî dihîşt û em gelek şevan şiyar diman lê rewş ne li gor daxwaz û dilgermiya me bû, ji ber wê yekê ez û gelek hevnişên xwe, em di dawiya salên nodî de rastî wendabûn û dilsariyeke dijwar bûn.

Imer Kalo: Ma ev hevokê tê bîra we; ((Soz pîroze, ger ku kevir bibarin jî, divê soz pêk were)), we çi sîd ji vê hevokê di jiyana xwe de wergirt?.

Salih Demîcer: Erê çawa na, ew xweş tê bîra min, ne tenê tê bîra min wekû pêgirî bi karê siyasî û amadebûna civînan di dem û qonaxê de, ew ta roja îro jî hîn di jiyana min de rêbazeke, ez bi awakî rîjdî li ser kar dikim û ji bo pêkanîna wê rastî gelek kêşeyan bûme û dibim. Ji bo vê hevokê, min gelek dost bicîhîştin û pêwendiyên min bi gelek re jî sist bûn. Dostê ku di sozên xwe de neyê dîtin, ew bêhtirî gunehekî dike. Ew derwê dike, te dixapîne û dihêle tu li ser soza wî rastî şaşî û ziyane bibî. Ji ber vê yekê, tu nikarî baweriyê pê bikî û tiştêkî bispêrî wî.

Imer Kalo: Di navbera jiyana gundê Şêranê û bajarê Beyrûtê de, win ana giyanê xwe li ku derê dibînin?.

... Dûmahîk Rûpel: 20

HEVPEYVÎNEK LI GEL NIVÎSKAR**SALIH DEMÎCER ... Dûmahîk:**

Salih Demîcer: Bi rastî çiqas nakokî di navbera Şêranê û Beyrûtê de hebin wekû du cihên cîyawaz ku her yekê ji wan çandêke xwe ye taybet heye di warê civakî û dan û standin û ast û şeweyê jiyane de, û bê guman yek bixwaze nexwaze evê taybetmendiyê jî bandora xwe li ser mirov heye û hindêk guhertin di jiyana wî de çêdike. Lê mirov ji aliyê giyanî de bêhtir bi cih û warê zarokiyê ve tê girêdan.

Û bê guman gundê Şêranê jî wekû cihekî ku zarokî û bîranînên min himbêz kirin, ew bêhtir giyanê min ber bi xwe ve radikşîne. Li gel ku ev bû panzde sal ez li Lubnan dijîm û Jiyanê Beyrûtê xweştire jî, bawerke ez rojê carekê hest dibim ku ez rêwîme li vir û divê sibe an dusibe vegerim Sûrî û Kobanê û Şêranê .

Ez zanim ku ev bersiv di forma xwe de bersiveke kilasîkî ye û her kesê ji welatê xwe dût, wê dubare dike, lê di naverok û dîtaylên wê de her yekî ji me rastî û çîrokeke diltezîn û taybet heye ku gelek caran bi axaftinê şîrove nabe.

Imer Kalo: We çi karê biv di mafê welatê xwe de kiriye, ta ku win li ser xaka wî hatin qedexekirin?.

Salih Demîcer: Di yaseya rejîma Sûriyê de, her kesê ku ji wan re çepikan lê ne de û di şanoyên wan de ne qeşmerbe, ew ne li gel wan e, û her kesê ne li gel wan ew li dijî wan e. Û ji xwe re hesab bike çiqas kurd li dijî wanin. Ew xwe dibînin padîşah û xwedayên vî welatî û dikarin li dijî her kesê ne li gel wan fermanan derxin. Û vaye li hindir wiha dikin, tu li wirî û baş dibînî çawa ew bi awakî hovane xortên me digrin û pêşeroja wan û zarokên wan winda dikin. Ne tenê ez, bi sedan û renga bi hezaran xortên me nikarin vegehin welat ji ber ku hatina wan jiyana wan rastî metirsiyan dike. Raste ew tu biryarên fermî li dijî te dernaxin, lê ji bo gotarekê an axaftinek a ku ne li gor dilê wan be, dikarin bi salan te bavêjin binê zîndanên bêyî ku haya kesî ji te hebe û karibe te biparêze.

WÊJEYA KURDÎ


Imer Kalo: Ji bo çi we nivîsandina çîrokê di nav celebên wêjeya kurdî de hilbijart?.

Salih Demîcer: Wek xortekî dilgerm û behremend di dawiya salên 80 yî de min hewil da ku ez di gelek biwarên toreyî de binivîsim, min helbest nivîsand, şano nivîsand, balname nivîsandin, û hindêk caran bi `erebî jî, lê bi rastî çîrokê bêhtir bala min kişandê ser xwe, ez bêhtir bi çîrokên kurdî yên kevin daxbar bûn, ji xwe min ji zarokiya xwe de pir ji çîrokên kalemêr û pîrejinan yên devkî hez dikir, û ez li benda êvarê dimam ku mezinên me li malekê kombîn û dest bi gotina çîrok û serpêhatî û bûyerên gundiyan e rojane bikin.

Di wî temenî de me li çîrokên herî seyr û xeyalî wekû rastiyeke li dar, temaşe dikir , ew perçeyek bûn ji jiyana me û em jî lehengên wanbûn, tiştên me êvarê dibihîstin me serê sibê li gel hevalan bi kar di anî. Loma min xwe bêhtir di wî warî de dît.

Min dît ez dikarim bêhtirî helbestê û şano, wan êş û diyarde yên neyênî di civakê de bi hûrbînî û bi awakî nûjen nîşan bidim, min didît ez têde bêhtir azadim û dikarim her bûyerekê an serpêhatiyekê bi hêsanî bikim çîrok.

Min ji helbestê jî hez dikir lê nizamim çima wê demê baweriyê ne durust li nik min çêbû ku helbest tenê ji bo babetên niştimanî û şoreşgerî û azadî û serxwebûna kurdistanê ye, û min jî dixwest bûyerên rojane bişopînim bêhtirî wan babetên mezin. Bê guman piştî demekê min nas kir ku babet girêdayîye bi kesê nivîskar ve, ne bi cûreyê toreyî ve.



Tiştêkî din jî hîşt ez berê xwe bidim çîrokê, min dixwest ez tiştêkî cuda ji hevnişên xwe binivîsim. Wê demê gelek hevalên min helbest dinivîsandin, loma min çîrok hilbijart.

Imer Kalo: Di baweriyê we de mercên nivîsandina çîrokê çine, û çîroka serkeftî bi çi tê nirxandin?.

Salih Demîcer: Çîrok bi têgeha xwe ya giştî û kilasîkî ew jî wek helbesta kilasîkî bi gelek mercên asê û dijwar di warê teknîk û avakirinê de dihate pîvan, lê çîroka kurt wekû hunereke nuh di toreyê de, wê ev merc û sînor li dû xwe hîştine û nivîskar û rexnevan bi xemsarî li mercên çîroka kilasîkî dinêrin. Ew nema bi wan pîvanên rîjdî hebûna destpêk û girêk û çareyê û nebûna wan di çîrokê de dinirxînin. Çîroka nûjen ew tê nirxandin wek ronîkirin ji dem an cih an kesekî destnişankirî re, ne wek pêşankirin ji pirsgerêk an babetekê re û piştê danîna çareserkirinê jê re.

Roja îro çîroka serkeftî bi kurtî ewe çîroka ku wekû laşekî hevîrtî berê xwe dide cihekî û li nîva rê hilnawêşe.

Imer Kalo: Çîrokên bi navnişana mirin û kuştinê di berhemên we de balkêşin, ji bo çi dúbarekirina mirin û kuştinê?.

Salih Demîcer: Di nivîsandina çîrokên xwe de, ez gelekî miqateme ku nêzîkbim ji bûyerên rajane yên ku di jiyana me kurdan de dibin, bi taybetî li herêma Kobanê û eger navnişanên kuştinê - û ez dixwazim bêjim kuştin ne mirin, ji ber ku mirin jî di çîrokên min de encama kuştinê ye, ne mirineke xweristî ye -, eger ew navnişan pirin bawerbike ku wêneyên kuştinê li Kobanê ji yên jiyane bêhtirin, ev jî ne reşbîniyeke bi qasî ku rastiyeke li dare, bawerke kak Imer, xelkê kobanê bi zora hêviyan rojên xwe bi dawî tînin û tu jî ji vî rewşê ne dûtî.

Mirov ne tenê bi gulleyan tê kuştin bira, mirov carne bi gotinekê jî tê kuştin. perîşanî, nezani, gerdişt û nerêtên neyînî û kevin, nebûna derfetên pêşveçûnê. Ev hemî formên kuştinê ne an jî piroje ne jê re.

Imer Kalo: Win asta çîroka kurdî-kurmancî li rojavayê Kurdistanê; Sûriyê çawa dinirxînin?.

Salih Demîcer: Ne veşartiyê ku milletê kurd li dirêjiya dîroka xwe, di nîrên gelek asê û dijwar de jiya û hîn dijî, ku çi derfet jêre nebûn li toreyê xwe vegere û bi awakî rêk û pêk wê li ser bingeheên saxlem deyne û ji belavbûn û windabûnê biparêze.

... DûmahîkRûpel:21

HEVPEYVÎNEK LI GEL NIVÎSKAR SALIH DEMÎCER ... Dûmahîk:



Em baş dizanin ku hemî celebên toreyî li ser ziman ava dibin û zimanê kurdî jî ta roja îro hîn ji fêrbûn û bi karanîna fermî bê par e, loma herdem ciyawaziyek di navbera asta dahênana kurdan û berhemên wan de hebû. Lê li gel vê yekê û peydanebûna derfetên aborî jî, wan karibûn gavên balkêş di gelek biwaran de bavêjin, û li gel ku kurte çîrok jî hunereke nûye li gor celebên din li ser asta hemî welatên cîhanê, nivîskarên kurd li deriyê wê jî dan û tiştin baş nivîsandin, bi taybetî bi derketina kovara Hawarê re di destpêka salên sî ji sedsala bûrî.

Herçendî çîroknivîsên wê demê ronî didan ser babetên giştî û pirsgirêkên netewî û şoreşgerî û axa û began jî, lê bi rastî wan karibûn bi zimanekî xweş û gotinên sade bingehê ji kurteçîrokê re wekû hunereke serbixwe damezrînin.

Mixabin ev bingeh piştî şerê navnetewî yê duyem kar jêre nebû û çîroka kurdî di qonaxêke ziwa re derbas bû ta ku di salên heyştê û nodî de careke din bi hindêk berhemên nirxdar diyar bû û evbû çend salin jî dîsa sist bûye.

Di nerîna min de, ji bilî wan fakterên me anî ziman, nebûna xwendevan û rexnevan jî bêhtir rola xwe di sistbûn û li şûn mayîn a kurte çîrokê de list û dilîze .

Imer Kalo: Gellek nivîskarên kurd piştî çîrokê berê xwe dane romanê. Win jî bi nivîsandina romanê de nafikirin?

Salih Demîcer: Hebûna seqamgêrî û aramiyê di jiyana kesê nivîskar de roleke diyar û berbiçav di nivîsandina romanê de dilîze, çimkî roman divê wexteke dûr û dirêj jêre bête terxankirin, û vaye em dibînin çima bêhtirî romanên kurdî li derveyî welat hatine nivîsandin. Berî çend salan ez bi romanê difikirim, lê bi rastî di rewşa min a niha de ez nikarim bi çi rengî nêzîkî romanê bibim, nebûna seqamgîriyê di jiyana min de hiştiye ku ez ne tenê bîrokeya romanê, belê nivîsandina çîrokê jî, bo qonaxêke din ragirim.

Lê ez dixwazim di derbarê pêwendiya çîrok û romanê de tiştêkî bêjim. Li gel ku çîroknivîs bêhtirî kesên din amadeye bibe romannivîs, lê nivîsandina romanê ne qonaxêke pêşketî ye ji nivîsandina çîrokê re. Ew du hunerên cuda ne û her yekê ji wan kesayetiyeke e xwe ye serbixwe heye, ji ber vê yekê, ji her çîroknivîsekî nayê xwestin ku bibe romannivîs, tu dikarî bimîni çîroknivîsekî dahêner û tede şoreşekê jî awakî, bêyî ku tu nêzîkî romanê bibî.

Imer Kalo: Di baweriya we de cudahiya sereke û bingehîn di navbera hunera çîrok û romanê de çine?

Salih Demîcer: Roman di forma xwe de çîrokeke dirêje, lê ew di hundirê xwe de festîvaleke ji çîrokan, ku hinek ji wan tene pêşankirin û hinek jî di qorzkên romanê de nehênî dimînin û tenê bi hevokekê tene nîşan dan. Roman bi vehewandin çîrokên ciyawaz û tevlihevkirina wan bi awakî rêk û pêk taybetmendiyekê ji xwe re diafirine .

Di çîrokê de kurt kirin û bi kar anîna sîmbolan dihêle ew hinekî giran û tîr be. Lê di romanê de divê ew tîrbûn û siqbûna han hinekî ji hev vereşe.

Bi wateyeke din, roman zincîreke û çîrok gustîlkeke û her yekê jî şewq û vebrûsîneke xwe ya taybet heye.

Imer Kalo: Me ji mêj de çîrokên we yên nû nedîtine, ji bo çi we nivîsandina çîrokan rawestandîye?

Salih Demîcer: Raste ev bû demeke min çîrok ne nivîsandine, ev jî min got, girêdaye bi guhertinên ku di rewşa min de çêbûyî di van salên dawiyê de. Karê minî nûh di warê ragihandinê de, ew bêhtir wexta min dibe û kargeriyeke li ser pêwendiya min bi çîrokê re dike. Ez jî naxwazim di vê demê de çîrokê binivîsînim ku bêhna rojnamegeriyê jê bikele û ez di xwe de jî nabînim ku gihîştîme wê radeya ku tede karibim di herdû biwaran de binivîsînim bêyî ku wan tevlihevkim.

Nivîsandina çîrokê li nik min pirojeyêke ragirtiye bêhtirî ku ew hatibe rawestandî, ez geşbînim ku ezê di demeke nêzîk de lê vegerim.

Imer Kalo: Di vê demê dawiyê de we hinekî berê xwe daye nivîsandina gotarê bi zimanê 'erebî. Ji bo çi nivîsandina bi zimanê 'erebî?'

Salih Demîcer: Ez bawerim nivîsandina gotarên `erebî, wê bi awakî raste rast pêwendî bi şoreşa milletê Sûrê heye. Ez dixwazim helwesta min a siyasî ji şoreşê wekû kurdekî bigihe biraderên meye `ereb. Ez hest dibim ku ew erkeke niştimanî û karekî piratîkiye divê ez pê rabim, bêhtirî ku behreyêke dahênanî be di jiyana min de, ango ew tiştêkî demîn e û girêdaye bi qonaxa niha de û renga ew bête rawestan bi dawî hatina vê qonaxê re.

RAGIHANDINA KURDÎ

Imer Kalo: Win wek kesayetiyeke serbixwe û li gor serpehatiya we, win karê di dezgehên ragihandina partiyên kurdî de çawa dibînin?

Salih Demîcer: Te rastî divê, dezgehên ragihandinê di nava partiyên kurdî de nînin. Em behsa partiyên kurdî li Sûrê dikin. Ragihandina wan belevoka wan a mehane ye ku ew bêhtirî pence sale bi heman şêwe û heman form derdikeve, bêyî ku tu guhertinên rijdî û berbiçav tede çêbin. Bêguman ez vê yekê bi dilekî şewitî dibêjim ne ku henekên xwe bi wan dikim. Partiyên kurdî ji roja roj de nikaribûn ragihandinê ji siyasetê veqetînin û ji ber wiha ragihandina wan ma ragihandineke seqet û girtiya dubendî û nerînên teng.

Raste çênabe em bi pîvanên ragihandina milletekî serbixwe ya partiyên kurdî binirxînin. Lê eger wan pilan û pirojeyên rijdî di vê derbarê de hebûna, wan dikaribû li dirêjiya pence salî tiştêkî berbiçav sazkin.

Nebûna derfetên aborî û bingehêke gelêrî ye berferêh ji partiyên re - bi saya perçebûnên pir - wan jî roleke serekî di seqetî û pûçbûna ragihandinê de list. ... **Dûmahîk Rûpel:22**

HEVPEYVÎNEK LI GEL NIVÎSKAR**SALIH DEMÎCER**

... Dûmahîk:

Vaye tu dibînî ta roja îro, ne tilfizyonek, ne radyok, ne ajanseke nûçeyan, ne malpereke bi rêk û pêk. Wan tiştêk nîne ji bilî hinek belavokên mehane û kovarên ku her çend salan carekê derdikevin.

Mixabin Partiyên kurdî bi xemsarî li ragihandinê nihêrîn, ji ber vê yekê wan li gor temenê xwe yê dirêj nikaribûn çî gavên rîjdî di xebata xwe de bavêjin.

Imer Kalo: Win weşana televizyonê kurdî bi gelemperî çawa dinirxînin û çî di weşana wan de ji bo we balkêşe?

Salih Demîcer: Başê ne xerabe, li gor temenê wan ê kurt, wan gavin baş avêtin û peydabûna derfetên aborî û piştgiyariya siyasî li herêma Kurdistan, alîkariya wan kir û xelkê kurd bi wan ve hate girêdan, bi taybetî di warê pirogramên hunerî û hemareng de, lê mixabin ew di warê siyasî û rêzdariya nerînê û nerîna din de, li ser asta tevahiya kurdistanê bi rola xwe ranebûn û tiştêkî rîjdî pêşkêş nekirin. Divê ew li ser vê yekê kar bikin, û eger bixwazin karin bikin.

Imer Kalo: Ger ku ez bibêjim weşana Roj TV ji hemû televizyonên kurdî Kurdistanîre, ango weşanê ji her çar perçeyên Kurdistanê re dike. Win çawa dibînin?

Salih Demîcer: Roj tv tilfizyonek a kurdî ye û ez bi çavê rêzdariyê li xebatkarên wê dinêrim ku wan pir zor û zehmetî dîtî ji bo berdeamiya weşana xwe û gelek caran neçar man navê tilfizyonê biguhêrin ji ber ku şerê wan bi awakî mezin dibû û hîn jî dibe. Lê ez ne bi tere me ku ew tilfizyoneke kurdistanî ye, bi wateya ku weşanê ji her çar perçeyên kurdistanê re dike.

Roj tv zimanê partiyeke kurdî ye ku layengerên xwe li herçar perçeyên Kurdistanê hene. Ew bi awakî aşkere û diyar pêgire bi rêbaza wê partiyê û li derveyî vê yekê, ew rê nade çî nerîn û helwestên din ku ronahiyê bibînin. Ne tenê ew, tilfizyonên kurdî bi giştî wiha ne, Kurdistan TV jî wihaye, Kurdsat jî wihaye... Ew hîn di qonaxekê de ne ku nikarin nerîna din qebûl bikin û biparêzin.

Pêgiriya bi ragihandeneke azad û serbixwe hîn di mejiyê kurdî de bi awakî berferê nehatiye meyndin û qebûlkin.

Imer Kalo: Malperên kurdên rojavayê Kurdistanê li ser enternet ê gellekin. Win asta xebat û weşana wan çawa dinirxînin?

Salih Demîcer: bi dîtina min asta malperên kurdên rojava li gor ragihandina partiyên wan, bilinde. Wan hinekî ew asoyên teng derbaskirine. Sedema vê yekê jî ewe ku Êdîtor û rêvebirên wan li derveyî welatin û derfet ji wan re çêdibe ku ji milletên din fêrî azadiya nerînê û nerîna din bibin.

Tenê wan kêmaniyek heye, ew jî nebûna cavdêrekî teknîkî ji berhem û gotarên heyî re. Ango her tiştê bigihe ber destê wan ew yekser belav dikan. Ev jî carne kêşeyan derdixe holê. Lê dîsa jî, di nerîna min de her tişt bête belevkirin baştîre ku her malperêk bibe zimanê xwediyê xwe .

Imer Kalo: Ger ku mirov bibêje asta rojnamegeriya kurdî li rojavayê Kurdistanê nizm û lawaze. Win rewşa wê çawa dinirxînin?


Salih Demîcer: Ew ne tenê lawaze, belê em hîn nikarin behsa wê wekû têgeheke ku merc û pêdiviyên rojnamegeriyê pêk tîne bikin. Ez li vir dixwazim tiştêkî li dor pirsên te ye berê jî ronî bikim, me behsa roman û çîrok û ragihandinê li rojavayê kurdistanê kir wek berhem û nimûneyên hazir, ne wek hebûna wan di çarçoweya têrm û têgehên serbixwe û giştî de.

Rojnamegerî ne behreyeke ku em li gor wexta xwe wê birêsin û rojnameyên xwe mehê carekê an sê mehan carekê derxin. Rojnamegerî karekî berdewame, ew desthelateke divê di her çax û demekê de û li her cihekî amade be û bi awakî rojane karê çavdêrî û şrovekirinê bike. Bê guman vê yekê jî pêwîstî bi dezgeh û rojnamegerên kadir heye û wan jî pêdivî bi bûdceyek a mehane heye û ev hemî jî -sipas ji xwedê re - li nik me nînin.

Imer Kalo: Li dawiyê gellekî spas û ger ku win dixwzin tiştêkî dîtir bibêjin fermo?

Salih Demîcer: Sipas ji bo kar û xebata te jî di warê rojnamegeriya kurdî de, em li benda wê rojê ku em têde karibin rojnameya Dilname û hemî rojameyên kurdî bi awakî rojane li ser pelan bixwinim, û ez bawerim ew roj ne dûre, serkeftin ji bo te.

(20-6-2011)

**BÎRWERIYA
PIRTÛKAN****SALAR Û MÎDYA****Cegerxwîn**

(1903 - 1984)

DÎYARÎ

Ji xortê ko barê mîlet dane ser milê xwe, û bi dijwarî di nav taristana zor û setema dijminê kurd ve bi gernasî derbas dibin.

Ji wan gundî û cotkarê ko di bin zor û setema kevneperestê Kurdistanê de, pişt xûz û gerdexwar, ji ko nanê zarokê xwe derxin, xebata destê xwe bi erzanî difroşin, sermayedar û xwedî gunda.

Ji bo wan gernasê ko di zindana de çavnêrîya ben û dare dijmin dikan û bi gernasî di riwê dijminê xwînxwar, setemkar de doza daxwazê kurd û mirovanîyê dikan. Ji bo va tevarê ez vê çîrokê bi dîyarî pêşkêş dikim.

Cegerxwîn - 1973

*Jêder: Ji çîroka seydayê Cegerxwîn
Salar û Mîdyâ hatiye girtin.*

ÇIMA JI HEV DÛR? ... Dûmahîk:

Ewqas salin di bin piyên neyar de, neyar bîn li şagirdê wî çikandiye. Nahêle bînê bide û bistîne.

Çare...

Lê em bi werîsan ji hev dûr.

Çima? Kî karika kê dizî kiriye?

Gelo zarûkên welatekî paramayî ne loma?

Berya kurd siwarê kerekî bibin, xelkê hespên rewan dane bezê, em para man loma?

Waye biyanî stêrkên ruyê ezmanan li hev parê dikin, lê hûn hîn bi kêranan ji hev dûr. Yên ku diçûn ji xelkê re weiz didan: 'Neyartiya hev nekin, heya hûn karin dost bin. Xwe ji nakokiyên piçûk dûr bidin,' digot. Kî bû?

Xortekî qîzekê birevanda, pêşiyê ew diçûn û ji dê û bavê qîzê re digot: 'Tişteki nabe apo, metê... De waye ji hev hez kirine, guneye meriv bikeve nava du dilan... Xwedê ji we razî, hima fatihêki bixwînin, bila biqede. Bila zarûk bigîjin miradê xwe.' Apo bi ya we nekira, we xwe hêrs dikir: 'Binêre apo!.. Lazime tu, guh bidî, çika em çi dibêjin!.. Nexwe tu zanî!..'

Wê demê yê şev û roj li kêleka hev, îro bi misasan valahî di nava we de heye. Êdî wisa buye ku li civatan jî behsa hev nakin. Ewqas ji hev dûr ketine ku navê hev jî ji bîr kirine.

Gelo çima ewqas dûrbûn? Kara kî tê heye?

We ji gundiyan kurd re digot: 'Ji bona ku zaneyên me yê berê xwe nedan teniştê hev, loma em wisa nezan man... Eger ew bibûna yek kulm, belkî anka em di vê rewşê de nebûna...' Lê mixabin ji hev dûr in. Fena mala Cemîl Paşa û Bedirxaniyan. Berê hinan li rojhilat, yê hinên din jî li rojava. Fena zanayên dem û dewranên berê.

Gelo kêmasî ye an na?

Raya we nizanî.

Gelo dem nehatiye ku rîspiyên kurd werin cem hev û bi hev re henekan bikin. Bi wan henekan temen dirêj bikin... Qala xortaniya xwe ji hev re bikin, bibêjin: 'Ciranêke me hebû... Bejna kafirbavê mîna taya rîhanê, bejintenik, mijagên wê fena kêran, yeke qerqaş û pozbelik bû. Gava dikeniya, di bexçeyê dil de gul û kulîlk dipişkiyên. Bi bêbavê re, çi keneke şîrîn hebû. Meriv bi wê kenê, diçû diyarê çiyayê Heftguhar, dibûn mêvanê zozanê darmazî.'

Yekî din: 'Safikekî gundê me hebû, navê wî Hemo bû. Lê gundiyan jê re digot: "Mamê Hemo." Û behsa serûwenên Mamê Hem bike. Yê guhdar jî safikiya Mamê Hemo û yê xelkê bidin ber hev, çika îro çi cûdahî çêbûne?...

Hela ew çîrokên berriyê... Rebenan çiya ji nêz de nedîtine, dema di çîrokan de behsa çiyayên jorîn dikirin, bi pesn û salixên dûr û dirêj, yek bi ser heftan de dikirin, çiyayekî didan ser heft çiyayên din û hîn behs dikirin. Pêre jî xweş dikirin. Zanibûn bala meriv bikişînin û xwe bi meriv bidin guhdarîkirin. Ew mezinkirin û direwên pêve jî, bîna meriv pê derdiket, dibûn tewaş.

Yekî din jî bibêje: 'Wele dengbêjekî li gundê me hebû, dema stiran digot, bilbil dihat ser guliyên dara devê eywanê û guhdariya wî dikir. Deng nebû!.. Fena dengê girîna bilûrê, têlên sentûrê. Dema stirana melodiram ya Edûlê digot, ava çem û kaniyan disekinî. 'De lê lê Edûûlêêêê' digot û dirêj dikir. Îcar pêre jî 'ha hîî ha hîî ha hîîîî' dikişand. Civat jî têkilê hahiya dengbêj dibû. Qey kul û kesir di bîr û xiyal de dihîşt? Bê dengê dengbêj, meriv bi nîgariya stiranê re diçû serê gaz û gedûgan, devê çema, dibû şîreşîra avê. Masiyan di nava avê de çil didan, teqle li wan diket û binê zikê wan spî dikir.'

Qey tehma van bîranînan tenê bi hev re ne hêjaye? Meriv nikare ji niha de zarûkan bike dostên hev û ji pêşerojê re amade bike, qama zarûkên xwe dirêj bike. Ji sihêtîkirinên bav û bapîrên xwe sûd wergirin.

Bi reya min meriv kare.

Xwe ji hev xeydandin, karê zarûkan e. Behsa xortaniya xwe kirin û şaşiyên dîtin tişteki ji me nabe, dide qezenckirin. Em pir hindik, dema xêşîmî û xortaniya hev zanin. Lê vê dema têtîhîştî na. Em nizanin çika kî çiqas dirêj buye. Lê xuyaye ji qamdadayina ber hev jî direvin. Ev rev heya gengê? Bi qurana min xwendî, feyda kesê tê de tune.

(PARIS)

**DESTANA
DEWRÊŞÊ
EVDÎ WEK
ROMAN
ÇAP BÛ**



Destana Dewrêşê Evdî di nav Kurdistan de li gelek herêman tê zanîn. Li Anatoliya navîn, Qafkasya, Serhed, Berriyê û gelek deverên din û bi her zaravayî tê gotin.

Çi Millî be, çi ne Millî; çi Kurmanc be, çi Dimillî; çi Misilman be û çi jî ne Misilman, herkes ji vê destanê hez dike, distrê û guhdarî dike.... Gelo çawa dibe ewqas bi dorfirehî ev destan tê gotin û hezkirin!

Evîna Dewrêşê Evdî û Edûleyê gelek balkêş û trajîk e; egîd û lehengê Milan Dewrêş Êzîdî ye û keça mîrê Milan Edûle jî Misilman e.

Evîna Dewrêş û Edûlê li nav Kurdistan gelek xweş têtê zanîn. Gelek versiyonên wê hene, gelek dengbêjê ve kilamê dibêjin.

Wekî ku têtê zanîn nivîskarê hêja Eyûp Kiran nivîskarê kitêbên wekî Milan Konfederasyonê, Pilingê Serhedê û Dewrêşê Evdî ye.

Kitêba wî ya herî baş têtê zanîn jî Dewrêşê Evdî ye.

Eyûp Kiran ji Siwêrekê ye, ji eşîra Kejanê. Eşîra Kejan di bin konfederasyona Millî de cih girtiye. Eyûp Kiran eşîra xwe, eşîra Millî, deyst û herêma Qerejdaxê tevan nas dike. Eşîra Millî eşîrekî Kurd e û bi nav û deng e û di nav Kurdistan de gelek cih girtiye.

Nivîskarê hêja bi lêgerînekê kûr û dirêj jiyar, evîn û têkoşîna Dewrêşê Evdî berhev kiriye.

Çîrokên ku li heremê li ser "Dewrêşê Evdî" hatine gotin, kilamên ku hene li ser tevan xebitiye û di dîwanan de demên dirêj ev kilam guhdarî kirine.

Pirtûka "Dewrêşê Evdî" çapa wê yekem çend sal berê ji hêla weşanxana Elmayê ve hatibû weşandin. Ev çapa duyem ji hêla zimanzan Zana Farqînî ve redaksiyona wê hatiye kirin.

Kitêb jî bi çap û bergê gelek xweş hatiye çapkirin.

Weşanxanê di dawiya kitêbê de ji bo kelîmeyên nayê zanîn 4 rûpel ferheng daye.

Navê Kitêbê: Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim, Nivîskar: Eyûp Kiran, Weşanxane: Nûbihar, Rûpel: 288, Çapa Duyem: 2011, isbn: 978-9944-360-95-1

Nûbihar-DER

YABAN LEHENGÊ WORLD CUPA JINAN YA SAL 2011 YE



Di roja Yekşema 17-7-2011 an de, tîma niştimanî ya jinên welatê Yabanê li welatê Almanya fainelê World Cupa Jinan yê sal 2011 an bi encama 2x2 (3x1) ji welatê Amerîka vexwar û yekemî car di dîroka xwe de bû lehengê cihanê.

Yekemîn golê tîma Yabanê di deqeya 81 an de ji aliyê lîstikvana yabanî Aya Mayama de bû, û golê duyem jî di deqeya 107 an de ji aliyê Homary Sawa de bû.

Lê yekemîn golê tîma Amerîka jî di deqeya 69 an de ji aliyê lîstikvana amerîkî Aleks Morcan de bû, û golê duyem jî di deqeya 104 an de ji aliyê Aby Wambak de bû.

16 tîmên ku di World Cupa Jinan ya sal 2011 an de li welatê Almanya beşdarbûn yê van welatan bûn:

- 1- Almanya, Frensa, Nêçîriya, Keneda.
- 2- Ingiltera, Yaban, Meksîk, Niyûzlenda.
- 3- Swêd, Amerîka, Kolombiya, Koriya Bakur.
- 4- Berazîl, Ustiraliya, Nerwic, Xîniya Istiwaî.

Wold Cupa Jinan di sala 1991 an de destpêkiriye, ya sala 2011 an de ya 6 an bû, wek Wold Cupa Peyan her 4 salan carekê lidardikeve.

Di dîroka Wold Cupa Jinan de welatê Amerîka 2 caran ew lehengî di salên 1991 û 1999 an de qezenckiriye.

Wek Amerîka welatê Almanya jî Wold Cupa Jinan 2 caran di salên 2003 û 2007 an de qezenckiriye.

Welatê Nerwicê jî wek Yabanê tenê carekê di sala 1995 an de qezenckiriye.

MEKSİK LEHENGÊ SAL 2011 YÊ CUPA KONKAKAF E



Di roja Yekşema 26-6-2011 an de, tîma niştimanî ya welatê Meksîkê li welatê Amerîka bi encama 4x2 an ji welatê Amerîka fainelê Gold Cupa sal 2011 vexwar û bû lehengê herêma Konkakaf. Ev 6mîn care ku Meksîk Gold Cup ê qezenc dike.

URGUWAY LEHENGÊ SAL 2011 YÊ COPA AMERICA YE



Di roja Yekşema 24-7-2011 an de, tîma niştimanî ya welatê Uruguway li welatê Arcentînê fainelê Copa America yê sal 2011 bi encama 3x0 ji welatê Paraguay vexwar û bû lehengê herêma Başûrê Amerîka. Uruguway bi wê encamê kete pêş Arcentînê û bû yekemîn welat ku 15 caran Copa America qezenc dike.

MEKSİK LEHENGÊ SAL 2011 YÊ WORLD CUPA CIWANAN E



Di roja Duşema 11-7-2011 an de, tîma niştimanî ya ciwanên welatê Meksîkê li welatê xwe fainelê World Cupa Ciwanên 17 Salî yê sal 2011 an bi encama 2x0 ji welatê Uruguway vexwar û duyemîn car di dîroka xwe de bû lehengê ciwanên cihanê.